



Parêzer Hasip Kaplan:

Rayedar wekî ku tu tişt çênebûye diaxivin, lê li aliyekî jî dewlet kêmaniyên xwe bi bîr dibe û lê dixebite ku wan safî bike. Ev du sal in di nava xebateke mezin de ye. Haya kesî zêde ji vê xebatê nîn e. Wezîrê Karên Derve yên Tirkiyeyê li ser mafên mirovan raporek girêda. Di vê raporê de îhlalên pêkhatî bi têra xwe hatibûn nivîsîn. Lê Dewleta Nehênî rê li ber vê yekê digire Rayedarên dewletê li ber medyayê rastiyê diyar nakin. Lê dema li hev rûdinin, dibêjin: "Divê meseleya kurd safî be û agirbest bê îlankirin." û hwd. Ev tespîten ku di nav xwe de dikin, bêhtir di cih de ne.

Cumhuriyet meşkeke qulqulî ye

Nûçe: Di cih de biryara înfazê dan

- Rûpel 3

Nejdet Buldan: Ew kurd li ku derê ne? r.5

Şehîd-Bîranîn: "Em roja azadiyê ne"

- Rûpel 6

Mirhem Yiğit: Nîqaşkirina romana kurdî r.7

Perwerdehî: Perwerdehî û hîndekarî-1

- Rûpel 4


Sîrwan Rehîm: Razêk û helwêstêk r.11

Nûçe: "Êdî em naxwazin dewlet li serê me bixe"

- Rûpel 16

Hasan Kaya: Bûyerek û xisletên neteweyî r.13

Azadiya WELAT



SAMI TAN

Mesûdê sertirko û kurdayetî

L i gorî agahiyên ku bi dest ketine, serîlêdana Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan bo penaberiyê ji hêla Dûmayê Rûsyayê ve bi dengê 298 endamên wê hatiye pejirandin. Ji bilî endamêkî, hemû endamên Dûmayê yên amade penaberiya Öcalan erê kiriye. Dûmayê biryar bo çespondina ji Serokê Rûsyayê Boris Yeltsîn re şand.

Li ser vê biryarê çapemeniya tirk kampanyaya li hemberî Rûsyayê gurtir kir. Hinekan got: 'Rûsyayê xayintî li me kir', hinekan got: Rûsyayê hambêza xwe ji Apo re vekir.' Piştî biryarê rayedarên dewleta tirk bi mirûzê tirş daxuyanî dan. Hate gotin ku ew ji hikûmetê hêvîdar in, da ku vê biryarê red bike. Dema Serokwezîrê Tirk Mesut Yılmaz daxuyanî da, li nik wî hemnavê wî Mesûd Barzanî hebû.

Mesûtê tirk ku her roj hevalekî wî ji ber endamtiya çeteyan tê girtin û bi biryara wî bi hezaran kurd hatine kuştin, Öcalan wekî bikuj bi nav kir û da zanîn ku dê hikûmeta Rûsyayê cih nede Öcalan. Di vê navê de Mesûdê sertirko (kurd ji mênêr ku ji gotina jinên xwe dernakevin

re dibêjin serjînik, ji ber ku Mesûd Barzanî jî ji gotina tirkan dernakeve, mirov dikare ji wî re sertirko bibêje.), qet xwe tevne, ji quretiya xwe tiştêk kêr nekir.

Mesûdê sertirko wisa bawer e ku dê karibe li ser xwîna kurdên Bakur, bo xwe qesrekê ava bike. Dewleta ku bo 15 milyon kurdên Bakur ji bilî qirkirinê tiştêkî nafikire, nahêle ku ew gomekê jî ava bike. Lê mixabin Mesûd Barzanî bîr nabe vê yekê. Li aliyê din rayedarên tirk hinde xwediyê hestên regezperest in ku naxwazin tu kes li ba wan ji tirkekî herî xerab re jî bide çêran. Lê Mesûd Barzanî qet mûyek li xwe şaş nekir. Mirovê kurd dema hinek ji mirovekî wan re li ba wan bide çêran, heke di navbera wî û yê din de dijminatî jî hebe vê yekê napejirîne. Heke dengê xwe neke dê mezinên wî bibêjin: "Te çima mîna kuryê keran guhên xwe li ba kirin, tûrê bînamûsiyê kişand serê xwe?"

Quretiya Mesûd Barzanî, çiroka mirovekî ehmeq anî bîra me. Dibêjin, li wela tekî mirovekî bîrbir û aqilmend dimire. Berî ku bimire bangî kurê xwe dike, jê

dixwaze ku îsqata wî bide yekî ehmeq. Kurê wî jî bi qasî bavê xwe bîrbir û eqilmend e. Digere nagere yekî ehmeq nabîne.

Dawiyê tê gundekî, dibîne ku heytehol û teşqeleyeke mezin heye. Mirovek paşpêkî li kerekê siwar kirine, dar û keviran li wî didin. Ji yekî dipirse, ka ew kî ye û ji ber çî li wî wisa dikin. Gundî dibêje ku ew keyayê gundê berê ye. Gundî di de zanîn ku li ba wan adet wilo ye, çî kesê ku ji keyatiyê bikeve vê yekê tînin serê wî.

Piştî vê yekê mîrik diçe nava gundînera ku yekî kincê xweşik li xwe kirine, li ser kursiyê rûniştîye bi quretî li derdora xwe temaşe dike. Dipirse ka ew ê qure kî ye. Lê re dibêjin ku ew jî keyayê nû ye. Dibêje gelo dema ew jî ji keyatiyê bikeve, dê li wî wilo nekin? Dibêjin 'Belê, adeta me welê ye'. Li ser vê yekê mîrik diçe îsqata bavê xwe di de keyayê nû.

Heke dewleta tirk bigihêje mebest û armanca xwe dê Mesûd û partiya wî jî li holê nemîne, lewre dê kurdayetî ji holê rabe.

Spot: Mesûdê sertirko wisa bawer e ku dê karibe li ser xwîna kurdên Bakur, bo xwe qesrekê ava bike. Dewleta ku bo 15 milyon kurdên Bakur ji bilî qirkirinê tiştêkî nafikire, nahêle ku ew gomekê jî ava bike. Lê mixabin Mesûd Barzanî bîr nabe vê yekê.

Rêxistina Îxanetê: PDK

VEDAT AYDIN

Ferhengok

ardû: yakacak
berban: şaneşin (balkon)

bergirî: önlem
berjeng: nişane, delîl

bireser: nesne
dîyarde: olgu
fermanber: yê فرمانê pêk tîne

hevok: cümle
hilbend: benê meşkê

kelk: sūd, fêde
kêm: nêm (irin)

kirde: özne
komar: cumhuriyet

kujer: qetîl
kulî: hebên berfê

lêker: fiil
meşk: yayık

navborî: sözkonusu
nehênî: veşarî, ille-gal

nîgaşî: xeyalî
nîrzandin: helsen-gandin (değerlendirme)

parêzer: ebûqat
pelîşîn: hilweşîn,

rûxîn

pereng: pol (köz)
pêşnûmakirin:

tasarlamak

qulqulî: delik deşik
rawestgeh: durak

rayedar: yetkili

rikn: bingeh, hîm

rojgeran: gezegen

rondik: hêstir, firmêsk

saffîkirin: çareser kirin

sirûd: marş

şahînat: pîrozbahî

şarezahî: medeniyet

teqez: mutlaka

vedîzîn: xwe

veşartin:

veketin: ramedîn (uzanmak)

velîstin: veciniqîn;

burkulma

vîn: îrade

xunav: çiy; çiseleme

xunivîn: çiselemek

Gelê me rojên dîrokî dijî. Ne tenê welatê me, her wiha Rojhilata Navîn jî di vê demê de ji bo gelê me navendeke girîng û dîrokî ye.

Ji hêlekê ve qomplu û planên hovanê li ser gelê Kurdistanê tînin kirin û di kesayetiya Serokê Netewî de tê xwestin ku gelê kurd ji holê bê rakirin. Ji hêla din ve bi vê qomploya mezin ve girêdayî, planên şerê Rojhilata Navîn, ji aliyê komara tirk ve tê kirin û heye ku ev şer bibe şerê cihanê yê sêyemîn jî. Eniya şerxwaz û çavsor ku ji aliyê împeryalizma Amerîka, Sîyonizma Îsraîl û Kemalîzma KT ve bi kar tê vala nasêkine. Lewre ew dijminê gelê me, dijminê mirovahiyê ne.

Belê Amerîka, Îsraîl, KT dijmin in. Lê dijmin ne ew bi tenê ne. Hevkarên wan ên hundir, serkêşên îxanetê jî dijminê vî gelî ne.

Bi taybetî îro li başûr PDK'ê Berzanî dîsa dixwaze bi serkêşiya îxanetê ji xwe re cihekî bigire. Ji bo vê yekê PDK û YNK di rêberiya Amerîka de bi navê "Pêvajoya Waşington" ketin riya êrîşê nû. PDK êrîşên xwe berdewam kir û guh neda dengê aşî û yekîtiyê yê Partiya Karkerên Kurdistanê. Erişê wan ya dawîn ya li Çiyayê Garê, maskeya rûyê wan qetand. Ew hêza PDK ê tune ku bi serê xwe ve yekê bike. Ji ber vê yekê ku ji mîj ve PDK piştî xwe di de Amerîka, Îsraîl, KT û İran (beriya Şoreşa Îslamê). PDK çare her dem di hevkarîya zordes-

tan de dît û xwe li wan girt. Do wisa be, îro jî wisa ye. Mînakên vê yekê gelekin. Îro Pêvajoya Waşington ê, Pêvajoya Dublînê, pêr pêvajoya peymanê Cezayir û hwd. Pêvajoya peymanê Cezayirê (8 Adar 1975) di vî warî de gelekî balkêş e. Piştî vê peymanê têkçûna PDK'ê ya mezin dest pê dike.

Di adara 1970'yî de di nav PDK û rejîma Îraqê de peymanê otonomî tê îmzekirin. Çend xal ji vê peymanê jê ev in: Digel zimanê Erebi zimanê kurdî

û Amerîka ye. Digel vê yekê di adara 1974'an de deklarasîyona otonomîyê nû ji aliyê rejîma Îraqê ve tê îlan kirin û ji bo PDK ve otonomîyê bipejirîne, 15 roj muhlet didine wê. Lê PDK, bi bawerîya hevkarên xwe guh nade vê yekê û piştî 15 rojan şerêkî pir giran dest pê dike. Lê di germahiya şerê de Îran di beramberî hin tavîzên ji Îraqê wergirt (Îraq ji îdiakirina mafê xwe yê li ser Şatul-Erebê geriya) û pê re rûnişt. Li Cezayirê peyman di nava Îran û Îraqê de hate îmzekirin.

Îro PDK dîsa dixwaze bi serkêşiya îxanetê ji xwe re cihekî bigire. Ji bo vê yekê PDK û YNK bi navê "Pêvajoya Waşington" ketin riya êrîşê nû. Wê guh neda dengê aşî û yekîtiyê.

Piştî vê peymanê Îranê alîkariya xwe ji PDK kişand û têkçûna PDK'ê dest pê kir. Piştî vê, bi salan têkoşîna Başûr bi ser xwe ve nehat. Bi tenê di pêvajoya 70'yî de mirov dikare îxanet, bêbawerî, bêvîn û hêziya PDK'ê bibîne. Wer dixuye ku PDK tu ders ji dîroka îxaneta xwe dernexistiye. Îro dîsa bi "Pêvajoya Waşingtonê" dîrokê

dubare dike.

Îro dîsa piştî xwe bi Amerîkayê ve girê didin. Qala federasyonê dikin, lê ev yek bêyî PKK'ê û heta dikare bê gotin ku li ser tasfiyekirina PKK'ê tê bikaranîn. Lê îro derfetên gelekî mezin di destê gelê Kurdistanê de hene. Mercên cihanê, herêmê û hundir gihîştine. Bi tenê yekîtiya Neteweyî rûniştîye û ev jî jî hêlekê ve bi PDK'ê ve girêdayî ye. Ger PDK were yekîtiya netewî; pêvajoya serxwebûnê jî dê ji gelê Kurdistan re vebe. Lê nayê! Lewra îxanetê di xwîna wê de cih girtiye. Ji bo vê jî êrîşî PKK'ê dike.

mîna zimanê fermî tê pejirandin, riya derfetên aborî tê vekirin, dibistanên kurdî tîne vekirin, efûya giştî tê îlan kirin, cîgirê serokwezîrê dê kurd be û xalîne mîna van.


Lê ev peyman li ser otonomîyê nabe. Lewra di wê demê de Amerîka, Îran, Îsraîl û KT rejîma Îraqê dîrî xwe dibînin û dixwazin wê bipelîşînin. Ji bo vê jî ew, heta dawiyê alîkariyê didine PDK'ê û wê dişînin ser Îraqê.

Di dawiyê de pêvajoya dipelîşe. PDK bi hin pêşniyarên van hêzên mezin tê xapandin û êrîşî Îraqê dike. Armanca pêkanîna berjewendiyên hêzên herêmê

Rotaya balafirê ziravê dewletê qetand

Di cih de biryara înfazê dan

Di 15 saliya tekoşîna rizgariya gelê kurd de yekem car tiştêkî bi vî rengî diqewime. Balafir di rojêke wisa de hate revandin ku bo kurdan rojêke zor watedar e. Digel watedarbûna rojê, Erdal Aksu dixwaze ku berê balafirê bide Lozanê ku peymana parçebûna kurdan di sala 1924'an de lê hatibû girêdan.



Erdal Aksu

yê ÎHD'ê Parêzer Osman Baydemir ji ber ku wî bisaxigirtina Aksu xwestiye, wekî "şêr (manyak)" bi nav kir û ew bo kontrayan wekî hedef nîşan da. Çapemeniya tirk, berî vêga Akın Birdal wekî hedef nîşan dabû û kontrayan 24'ê gulanê êrîş biribû ser Akın Birdal. Digel wê yekê di heman rojê de rojnameya Zamanê der barê malbata Aksu de gelek tiştên bêbinî nivîsandibûn.

Li ser vê yekê em bi Parêzer Osman Baydemir, ji malbata Erdal Aksu xwişka wî Arzu Aksu û bi Serokê Komeleya Rojnamegerên Hemdem İsmet Demirdöğen re axivîn. Li ser êrîşên rojnameya Hürriyetê, Baydemir wiha got: "Nûçegihanê Hürriyetê der barê revandina balafirê de got ku 'korsan' mirî hatiye bidestxistin, hûn

vê yekê çawa dinirxînin?" Min jî li gori normên hiqûqa mafên mirovan ên gerdûnî got: 'Diviyabû ew kes bi saxî bihata girtin.' Lê rojnameya Hürriyetê ev yek bi awayekî din şirove kir û ez wekî hedef hatim nîşandayîn. Ev ne tenê li dijî şexsê min e. Ev êrîşeke li dijî mafên mirovan e. Dîsa li dijî kesên azadîxwaz e. Rojnameya Hürriyetê bi kampanyayê

bi normên mafên mirovan yên gerdûnî, alîgirê saxgirtina Pînoşet û Yeşilê ku ji aliyê dewletê ve tê veşartin in jî. Baydemir wekî dawî got: "Divê Ekşi û Özkök lêborîna xwe ji gel bixwazin. Ez vê yekê yekem car bi navberkariya we radigihînim. Êrîşa li dijî me bo birîna dengê gel e. Tu sazî ango kasan jî heta vê saetê piştgirî nedane me. Lê gel piştgiriyê di-de me. Bi faksan protestoyên xwe bo rojnameya navborî bi rê dîke."

Em li çalakiya birayê xwe ya bi rûmet xwedî derdikevin

Der barê vê çalakiyê de xwişka Erdal Aksu, Arzu Aksu jî pirsên me bersivandin. Arzu Aksu di destpêkê de diyar kir ku, ew daxuyaniya ÎHD'yê piştgirî dîke. Wê got: "Me hêvî dikir ku birayê min sax bê girtin. Lê ew operasyon bo kuştinê hate lidarxistin." Ew, vê yekê wekî înfaza bê darizandin bi nav dîke. Li aliyê din malbata Aksu nêzîkedayîna rojnameya Zamanê wekî bêsincî û karekî pis û kirêt bi nav dîke û ji berpîrsên rojnameyê dixwaze ku îdiayên xwe îspat bikin. Aksu li ser nêzîkedayîna rojnameya Hürriyetê jî got ku: "Ji slogana serê rojnameya Hürriyetê diyar e ku ew xizmetî ku derê dîke. 'Tirkiye ya tirkan e.' Li



Osman Baydemir

daxuyaniya çapemeniyê bidin. Ew piştgiriyê ji raya demokratîk dixwazin. Ji aliyê din ve Aksu li ser bûyera di sala 1995'an de kuştina sê mamosteyan jî da zanîn ku tu eleqeya birayê wê bi bûyerê re nîn e. Ew, vê yekê wekî komplot binav dîkin. Aksu di dawiyê axaftina xwe de wiha got: "Birayê min insanekî gelekî dirust û hurmetkar bû. Dema ku li Amedê mamostefî dikir, ji zarokan gelekî hez dikir. Li wê derê dilê gel pê germ bûbû. Em li çalakiya birayê xwe ya bi rûmet xwedî derdikevin û diyar dîkin ku tu kes nikare vê çalakiyê bêwate bixe. Bila medyaya tirk rûne û di ser halê xwe de bigirî. Birayê min her dem alîgirê gelên mazlûm bû. Wî, di çalakiya xwe de ev yek jî da-ye selmandin."

Li vî welatî çapemenî propagandaya şer dîke

Serokê Komeleya Rojnamegerên Hemdem (ÇGD) İsmet Demirdöğen ji aliyê çapemeniyê ve hedef nîşandayîna kesên bo me nîrxand. Demirdöğen jî da zanîn ku hedef nîşandayîna kesên û biçûkxistina kesên ne ehlaqê rojnamegeriyê ye. Ev yek li dijî rêz û rêçikên gerdûnî yên rojnamegeriyê ye. Rojnameger İsmet Demirdöğen li ser çapemenî û rojnamegerî li Tirkiyeyê jî wiha got: "Mîxabin mirov nikare bibêje ku çapemeniya tirk li gori van prensîb û zagonên rojnamegeriyê tevdiqere. Bi taybetî piştî Derbeya 12'yê rêzberê pûç ketina çapemeniyê, guherîna di sermayeyê de, rojname û televîzyonên ku dû re derketine jî, ji prensîba bingeînê dûr ketine." Demirdöğen li ser şerxwaziya çapemeniya tirk jî wiha got: "Kesên ku ala tirk li ser 'Girên Kardakê' çikand û Tirkiye û Yewnanîstan ber bi şer ve birin, dîsa kesên ku Akın Birdal wekî hedef nîşan dan, endamên çapemeniyê bûn, lewre jî ez êrîşa li ser Osman Baydemir zêde ecêb nabînim. Ev qirêjîyek e ku di medyaya tirk di nav de ye. Divê ev qirêjî paqij bibe. Li vî welatî çapemenî propagandaya şer dîke."

AZAD ALTUN



Roja pîrozbahiyên komara tirk ev balafir tevî 36 rêwîyan ji aliyê Erdal Aksu ve hatibû revandin.

hem komele hem jî aktivîstên mafên mirovan hedef nîşan daye."

Parêzer Osman Baydemir bi taybetî li ser Oktay Ekşi û Ertuğrul Özkök rawestîya û da zanîn ku, ew ne bi îradeya xwe tevdiqerin, ew li gori daxwaza hinek kesên din dinivîsin. Baydemir got: "Em tu carî danakevin asta wan. Em ê li ser esasên meşrû û hiqûqî tekoşîna xwe bidomînin." Her wiha dîsa Baydemir daxuyîna ku ew ji ber bawerîya xwe ya

Tirkiyeyê gelên din jî hene. Ji aliyê vê çapemeniyê ve kuştina kesên alîgirê gelê bindest kurdan tê meşrûkirin. Li vî welatî sistem mafê jiyane yê herî normal jî nade kurdan. Wê mafê jiyana yekî wekî di rewşa birayê min de çawa bide." Di berdewama axaftina xwe de Aksu dide zanîn ku, ew dê li dijî derewên bo rûşîkirina malbatê dozê vekin, digel wê, wê bi alîkariya parêzerên ÎHD doza tazmînatê jî vekin. Dîsa wê di demeke kurt de

Çalakî û pîrozbahiyên 75 saliya komara tirk bi fiyaskoyê encam dan. Di roja pîrozbahiyên 75 saliya komarê de balafirê ku ji Edeneyê bi hewa ket, ji aliyê welatparêzê kurd ê bi navê Erdal Aksu ve hate revandin. Di 15 saliya tekoşîna rizgariya gelê kurd te yekem car tiştêkî bi vî rengî diqewime. Balafir di rojêke wisa de hate revandin ku bo kurdan rojêke zor watedar e. Digel watedarbûna rojê, Aksu dixwaze ku berê balafirê bide bajarê Swîsreyê Lozanê, ku peymana parçebûna kurdan di sala 1924'an de, lê hatibû girêdan. 1924'an de hatibû girêdan. Welatparêzê kurd jî di teyarê de der barê Lozan û tevkujiyên ku li ser kurdan pêk hatine de daxuyaniyekê dixwîne û daxuyaniyê bi slagona "Bi-jî Serok Apo" diqêdîne.

Piştî ku dewleta tirk bi derbestbûna bûyerê hesiya, di cih de biryara înfazkirina welatparêzê kurd girt û ew înfaz kir. Hemû çapemeniya tirk jî wê rojê bo înfazkirina welatparêzê kurd Erdal Aksu seferber bûbû. Balkêş e, berî diyarbûna navê kesê ku balafir revandibû, tîkiliya wî kesî bi HADEP'ê ve hate girêdan û hate diyarkirin ku ew berî demeke kurt di mîfîngeke HADEP'ê de hatiye dîtin. Çapemeniya tirk xwe bi van yekan tenê jî bi şînor nekir û etîka rojnamegeriyê da bin piyan û kuştina welatparêzê kurd bi kêfxweşî pêşwazî kir.

Her wiha çapemeniya tirk çavnebariya xwe li hemberî helwesta Cîgirê Serokê Giştî yê ÎHD'ê parêzer Osman Baydemir nîşan da. Roja 1'ê sermawezê rojnameya Hürriyetê Cîgirê Serokê Giştî

Perwerdehî û hîndekarî

Mirov li gorî rewşa xwe ya aborî teşe digire. Îcar îro gelê kurd û hemû gelên din, ji ber ku serxwebûna xwe ya aborî bi dest nexistine, ew bi şewaza perwerdehiyê mêtînger û nîjadperest teşe digirin. Mirovên ku bi vê şeweyî perwerde dibin ne fêda wan li gelê wan dibe û ne ji li gelên cîhanê dibe.

Danezana Mafên Mirovan ya Gerdûnî ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve di mêtîjuya 1948'an de bi biryara lijneya wezîran hate pejirandin. Piştî vê bûyerê bi yazdeh salan ango sala 1959'an de bi mebesta perwerdekirin û hînkirina zarokan "Danezana Mafên Zarokan" di rojnameya fermî de hate weşandin. Hejmara biryarê: 1386, Xala 7'an a vê danezanê wiha ye: Mafê zorakan ê perwerdehî û hîndekariya bi zimanê zikmakî û bêdirav mafekî jênager e. Ji bo ku zarok çanda xwe ya giştî hîn bibin, divê ku ew, di mercên yeksan de wekî hemû zarokan bi zimanê zikmakî perwerde bibin..."

Danezana Mafên Mirovan û Danezana Mafê Zarokan, di encama lihevkiyên navneteweyî de hatiye nivîsandin û bi şanavkirina hemû dewletên cîhanê hatiye pejirandin. KT jî yek ji wan dewletan e ku peyman bi şanavî xwe pejirandiye. Gelo qey NY'ê hay ji çil milyon kurd nîn e? An NY bi derewên KT'ê dixape û an jî nîzane ku bi kêre peyman daniye. Heja îro bêawarte, KT bi tu peymanên navneteweyî ve girêdayê nemaye, wekî hemû mafên mirovan, ew peymanên navneteweyî jî tim pêpes û bînpêkirine.

Ji bo ku civakek, na neteweyek li ser piyan bimîne, divê pêşî bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibe. Perwerdehî, di wateya giştî de, pêvajoya guhartina an sazandina

reftar û tevgerên mirov e. Bi rastî tu mirov nîn in ku nehatibin perwerdekirin. Çimkî pêvajoya hêvojkarîya mirov, hê di dema ducaniya (hemle) dayika mirov de dest pê dike û heta dawiya temenê wî didome. Ji ber wê, çi mirovên (heta ajal) ku dijîn bi perwerdehiyê nasdar dibin. Lêbelê bi çi şeweyî, bi çi şewazê, ji bo çi, çilo û di kîjan mercan de perwerde dibin? Berî her tiştî divê ku mirov têgihan rind binase an jî rind rave bike. Carekê çi tiştê ku hebe, bi tenê ne ji reş an ji spêk tîn. Li derveyî van rengan bêhejmar reng, an rengên din hene. Ev nêrînen ne rast û nêzîktêdayînen durrî zanistiyê, mirov ber bi çewtiyan de didêfin. Bo nimûne, heke mirov bibêje "Ev zarok bêperwerdehî maye" dê her kes vê hevokê li

An jî ji van hemûyan hîn dibe. Hîn bûn di encama perwerdehiyê de bi dest dikeve. Bi kinayî jiyana mirov bi perwerdehiyê dest pê dike, bi perwerdehiyê didome û bi perwerdehiyê bi encam dibe; bêperwerdehî nîn e. Cureyên perwerdehiyê hene û ew jî bi wesfên xwe, bi şewazên xwe, bi derfetên xwe ji hev û din cuda dubin. Em dixwazin li ser perwerdehiyêke bi rêz û rêçîk rawestî.

Cureyên perwerdehiyê

Ji hemû tiştan bêtir û girîngtir tiştê heye. Ew jî mebesta perwerdehiyê ye. Gelo îro perwerdehiya mirovên cîhanê bi çi mebestê pêk



Perwerdehî li mal dest pê dike.

gorî ramana xwe şrove bike. Lê belê dê hemû bibêjin: "Vî zarokî dibistan nîdîtiye û xwendina wî û nivîsandina wî nîn e. Lêbelê ya rast ne ev e, lewre hîndekarî û hêvotina zarok, bi dibistanê, bi xwendin û nivîsandinê bi sînor nabe. Rabûn û rûniştin, xwarin û vexwarin û hemû livbaziyan zarok bi perwerdehiyê pêk tîn. Çimkî zarok, bi xwe re tiştê neaniye dinê. Ger çi hîn bibê ji malbata xwe, ji civaka xwe, ji derdorê xwe, an jî ji dibistanê hîn dibe.

tê? Carekê, mebesta dewletên mêtînger û hêzên serdest ne mirov û mirovatî ye. Wekî hemû sazî û sazgehên din, dibistan, zanko û navendên perwerdehiyê bi mebesta berjewendiyên aborî û bi destê çînen birjuwa, ango bi destê dewletan ava dibin. Dewlet, ji bo ku pergalên xwe yê dagirker didomînin, mirovan li gorî berjewendiyên xwe û bi bîrdozên xwe perwerde dikin.

Dagirkerên tirk hê di pêçekê de dest diavêjin zarokan. Pitikên ku çavên xwe vedikin, xwe di nav vê perwerdehiya kambax de dibînin. Ji TV'yên wan bigire heta dibistanên wan di karê pişafîn û windakirina zarokên gelan de ne Hemû saziyên wan ji bo dijîminahî û cudakirina galan ketiyê pêşbirkê.

Dîsa dibêjin perwerdehî nîn e û perwerdehî tiştê e ku bi jiyana mirov dest pê dike û didome. Lêbelê, perwerdehiya erênî û neyînî heye. Perwerdehiya erênî ew e ku li ser bingeha zanistiyê ava bibe û timî ji bo edilandina tîkiliyên mirov pêk were. Tiştê ku şewaza jiyana mirov ango civakê didilîne perwerdehî ye. Lê perwerdehî ne tiştê diyarker e. Tiştê diyarker her dem rewşa aborî ye. Mirov li gorî rewşa xwe ya aborî teşe digire. Îcar îro gelê kurd û hemû gelên din, ji ber ku serxwebûna xwe ya aborî bi dest nexistine, ew bi şewaza perwerdehiyê mêtînger û nîjadperest teşe digirin. Mirovên ku bi vê şeweyî perwerde dibin ne fêda wan li gelê wan dibe û ne ji li gelên cîhanê dibe. Mirovê pişafî bêzar û ziman e.

Îro di dibistan û zanîngehên (pişafgehên) dagirkeran de bi milyonan zarok û ciwan perwerde dibin. Gelo çiqasî di perwerdehiyê erênî re derbas dibin? Gelo çiqasî bi tendurustî perwerde dibin? Her tişt diyar e. Mirovên (şagirtiyên) ku ji bo mafên xwe her roj jopên polîsan di nav guhên xwe de dibînin dê çilo bibin xwediyê kesayetiyan birûmet? Mamosteyên ku dibin ço de û bi lêdan û dijûnan perwerde dibin, dê ew zarokên-ciwanan bi çi şeweyî û bi şeweyekî çilo dikare perwerde bike? Carekê, pêdiviyên mamosteyan bi perwerdehiyêke zanistî û tekûz heye. Di zankoya dagirker de ramanên serbixwe nîn in. Hemû raman bi bîrdoza fermî ve sî-norkirî ne. Tu pisporên hêvojkarîyê nikarin li derveyî bîrdoza fermî biaxivin. Jixwe tu ramanên wan yê xweser jî nîn in. Yê ku xwediyê fikr û ramanên xweser bin û nêrînen xwe yê zanistî bin zimên, hemû di zindanan didirizin. Heta ku hîndekarî û perwerdehî li ser hîmên zanistî neyê edilandin, hîndekarî û hêvojkarîya ji bo mirov û ji bo gel negengaz e ku bi dest bikeve. (Dê bidome)

Rêzimanê kurmancî

- Wane 37 -

SAMÎ BERBANG

Xalbendî (niqteşanî)

Her wekî berê hatibû gotin, hevok li gorî hinek rêz û rêçikan li pey hev rêz-kirina peyvan e. Ji bo diyarkirina serê û binê hevokê hinek nîşane tên danîn, her wiha ji bo hêsankirina xwendina wê ji hinek nîşane pêwîst in. Li gorî van nîşaneyan, em bîna xwe berdidin, yan jî em bi rengê wê hevokê dizanin. Ji şewaza danîna van nîşaneyan re xalbendî yan jî bi awayê ku Celadet Bedirxan dibêje, niqteşanî tê gotin.

Di navlêkirina nîşaneyên xalbendiyê de jî cudatiyek balê dikişîne. Me xwest em navlêkirina Celadet Bedirxanî bingeh bigirin lê wî peyva "niqte" bi kar aniyê. Her wiha navlêkirinê wî yê din jî li ser vê bingehê hatin danîn. Wekî peyvên "niqtepirs, niqtecot, niqtebang û niqtebihnok". Ji ber ku ev peyv bi erebî ye îro di zimanê nivîskî de zêde nayê bikaranîn, ji peyvê bêhtir peyva "xal" tê bikaranîn. Navlêkirinê ku li jor hatin rêzkirin jî divê li ser he-man peyvê bîna rêzkirin.

Niha berî ku em li ser rist û peywira wan rawestin divê em nîşaneyên xalbendiyê li gorî wê navlêkirinê rêz bikin.

(.) xal

- (.) bêhnok
- (?) pirsnişan
- (:) xalecot
- (;) xalebêhnok
- () kevanek
- " " dunik
- xêzek
- bendik
- (...) sêxal
- (- -) du bendik

Xal

Ev nîşane dawiya hevokê nîşanî mirov dide, dema hevok diqede mirov xalêkê dafîne dawiya hevokê û bi vî rengî jî dide zanîn ku dawî li hevokê hatiye. Peyva piştî "xal"ê bi tîpa mezin dest pê dike.

Mînak:

Agir geş dibe.
Hevalan qûş li neyar teng kir.
Doza azadiyê doza mirovahiyê ye.
Gel bi serokatiya xwe serbilind e.
Dil bi dilan şa dibe.
Kevir û kuç li te bibarin.

Behnok:

Di nava hevokê de cihê ku mirov lê behna xwe vede nîşan dide. Bi vî awayî xwendina hevokê hêsantir dike, lê

divê ev bikaranîn wateya hevokê neguherîne. Her wiha ev nîşane dikeve nava du peyvên ku dane pey hev û diviya bi gihanekê bi hev ve bihatana girêdan. Ev nîşane, bi vî awayî cihê gihanekê digire.

Mînak:

Zozan, Zîn û Gurgîn çûn bajêr.
Li qeraxa çem, li ber qesrekê rawestiya.

Li gund darên tû, behîv, xox û hinaran hebûn.

Mirov bi ked, fikirin û axaftinê ji ajal vediqete.

Belê, êdî roja me hat.

Pirsnişan:

Her wekî ji navê wê jî diyar e, ev nîşane, tê dawiya hevokê pirsê û rengê pirsê dide hevokê. Ji ber ku di kurdî de pirs bi riya kirpandinê pêk tê di dawiya hevokê de bikaranîna wê nîşaneyê pêwîst e, bîyî wê mirov nikare rengê pirsê bide hevokan.

Mînak:

Robar bi ku de çû?
Hûn çûn bajêr?
Kevir li te ket?
Birîna wî xedar e?
Êzingên we hene?

Çavên te baş dibinin?

Ma êdî ne bes e?

Kê ji te re çi got?

Xalecot:

Gava di nava hevokê de tiştek tê gotin, an jî xisletên tiştekî tîna rêz-kirin, an jî wateya wê tê vegotin, xalecot tê bikaranîn. Ji bo zelalkirina wê mijarê jî çend mînak bes in.

Hevalê wî lê nihêrt û wiha got:
"Em dê te ji bibînin."

Tiştê ku mirovê çê ji yê xerab vediqetînin sê ne: Dilpakî, wêrekî û camêrî.

Rengdêr: Tiştê ku rengê navdêrê nîşan dide.

Wî got: Heke tu neçî, ez jî naçim.

Xalebêhnok:

Ev nîşane dikeve navbera du hevokên ku bi hev ve girêdayî ne û hev û din sergihayî dikin.

Çend mînak:

"Herçî niqte ne cihê rawesê ne; yanî di wan de mirov qederekî disekîne."

Herçî bihnok û niqtebihnok in cihê vêsîhê ne; di wan de em hindik disekînin vêsîha bihnokê ji hemîyan kurtir e."

Dilpakî di kar de diyar dibe; ne di gotin û galegalê de ye.

Kulîlk ne tenê bi rengê xwe xweş in; bi bêhna xwe jî dilê mirov geş dikin.

Ew kurd li ku derê ne?

NEJDET BULDAN



Belê me zanibû ku dewleta tirk li kurdan digere. Li Washingtonê, Romayê, Dublînê, Şamê, Moskowayê û gelek deverên dinyayê. Li rojavayê cîhanê û rojhilatê dinyayê. Li bakur û başûr. Li erd û esmanan. Li hemû deran pirs kurdan dike. Gelo ew kurd li ku derê ne?

Çima dipirsin? Dipirse da problemên wan çareser bikin? Baş e çima dipirsin? Ji bo girtinê di pirsê an ne? Ji bo kuştinê? An bo bajarên wan ava bikin, li tenduristiya wan binêrin, gundên wan bi av-rê-dibistan avadan bikin?

Şaş bûye ev dewlet. Ez bawer dikim ku bi sersala Cumhuriyeta xwe serxweş bûye.

Çavên dewletê êdî dinyayê nabînin. Belê belê serxweş e. Heke serxweş neba dê zanîbiya ku; pêwîst nîn e li dûrahiyan kurdan bigerin. Kurd ne li dûrahiyan in.

Erê belav bûne li gelek deveran. Lê kurd li Kurdistanê ne.

Dewlet jî li Kurdistanê ye. Heya ku hûn pirsgirêka kurdî di nava xwe de nebînin, rihetî ji bo wê nîn e. Bêaqil û nefêm. Serxweş. Yanî bi milyonan kurdan tu problema wan a neteweyî çareser neke. Û bêje ezê serokê PKK'ê bigirim an jî bikujim û mesele çareser dibe. Xeletiyên stratejîkî yê Komara Nijdevanan hene. Carê kurd û Kurdistan bi mirovekî tenê nayê naskirin. Erê birêz Öcalan cihê wî yê taybetî heye. Û gelek alozî û astengî ji bo tirkan çêkirine. Sebebê pêşveçûnê gelek mezin e li hêla kurdan û Rojhilata Navîn. Lê belê nayê wê wateyê ku ew bê kuştin, an jî girtin alozî xelas dibin.

Xeletiya duyem a herî mezin ev e ku, piştî ew qas şer û şehîdan, gazî û koçberan, şewat û qiyametên, nizanin ku ev ne riya çareserkirinê ne. Kurd êdî ne kurdên kevn in. Qebûlkirina gelê kurd, jiyanêke bi nasnameyêke neteweyî nebe kurd ranawestin. Pêwîst e ku ev çend bîna zanîn.

Bi dizîna kurdan jî pirsgirîng çareser nabe. Heke çareser bibûya, dewletê li ser wê jî xebateke gelek mezin kir. Bi navê

ceşnîyê, bi navê ajantiyê, bi navê sazîbûnê li Başûr û li Bakur gelek kurd hatine lêbandin û wan xwe firotin. Dîsa çênebû.

Gelek kurd revîyan, hatin girtin û kuştin. Lê Kurdistan yanî ax di cihê xwe de ma. Çareserkirin di nava Tirkiye û Kurdistanê de ye.

An ew çalakî ji bo hilbijartinan in? Ku partiyên şerê çekdarî "marjînal" bikin, ê desthilatiya Tirkiyeyê bi dest xwe ve bînin. Ew jî aqilekî xam e û nepijyayîye. Dibe ku çend heyvan germahiya şer raweste. Wê çendê jî nîşanî me da ku şer van dikarin agirbestê jî bikin. Û gelek caran jî agirbest kirine. Dîsa kêşeya kurd bi şeweyekî bingehîn tê çareserkirin?

Erê tirk. Erê çapemeniya Mehmedok. Pêwîst nîn e ku ew qas derew, ew qas lêgerîna li deveran. Çareserkirin di nava te de ye. Di mêjiyê we de ye. Heta ku hûn mêjiyê xwe neguherin, guhertin di vê meselê de nîn e. Problem di kuştin an jî girtina mirovekî de nîn e. Problem di meclîsa we de ye; di serleşkeriya we de ye; di siyaseta we ya xwînaxwar de ye. Pêwîst nîn e ku hûn derkevîne nêçîra kurdan, li erd û esmanan. Alozî di nava dest û piyên we de ne û di nava mêlak û mêjiyê we de ye.

Nameya Aynur Artan û Selamet Menteş:

"Em roja azadiyê ne kes nikare me bêtav bike"

Berî her tiştî, em li ser navê hemû kesên ku xwe wekî mirov dihesibînin, êrîşa li dijî Serokatîya Partiyê şermezar dikin. Mirovahiyê, di serpêhatiya xwe ya bi sê hezar salî de, cara yekem bedewiyêke bi vî rengî nas kir. Bi tenê "hûtên mirovahiyê", yên ku ji hemû taybetiyên mirovan bêpar in, dikarin li dijî Serokatîyêke ku hemû bedewiyên mirovahiyê di nava xwe de dihewîne, êrîşan pêk bînin. Dehayê Bedewiyê! Em gelekî hez ji te dikin. Destên ku qesta te bikin, dê bi agirê dilxwaziya me yê bo serkeftinê, bibin xwelî û arî.

Navê min Selamet Menteş (Kurdê) e. Ez li navçeya Çewlikê li Darahenê li gundê Sağgöze ji dayik bûm. Li navçeyê, em wekî eşîra Mistan tên nasîn. Eşîretê, ji ber ku di nava Serhildana Şêx Seîd de ref girtiye, li deverê nav û deng daye. Em şex xwişk û bira ne. Ji birayên min yek şehîd e, yek gerîla ye û yek jî ji ber êrîşêke kontrayî gazî ye. Ez biçûka malê me. Min dibistana seretayî qedand. Dema derbasî dibistana navîn bûm, min dest ji dibistanê hilanî. Ez di nava malbateke xwedî taybetiyên feodal û birjuwaziya biçûk de mezin bûm. Malbata min ji mêj ve welatparêz e. Dema 5 salî bûm, peyvên kurd û Kurdistan li ber guhê min diketin. Navê min Kurdistan ji wê demê maye. Min bi serhişkiyêke zarokane navê Kurdistan bi her kesî da qebûl kirin. Di nav eniyê de min xebatên cur bi cur pêk anîn. Lê bi awayekî fermî, di sala 1994'an de ez li Eyaleta Amedê tevî refên gerîla bûm.

Ev alak lixwerexnegirtin e

Piştî ku 3 rojan li pesarê (kursal) mam, hevalan ji bo ku dermanê hevalên birîndar peyda bikim, ez şandime Amedê. Lê ji ber ku ez li pey rêz û rêçikên îlegalîteyê neçûm, hatim girtin. Pêşîn li Girtîgeha Amedê peyre jî li Girtîgeha Midyadê mam. Min di warê rêveberî û hin warên din de kar gerand. Di serî de min îdeolojiya Partiyê başbaş fêm nekiribû, lewre min hem bingeha hin şasiyan danî û hem jî min ev şasî kirin. Cara pêşîn min da pey liberalîzma rastgir ya tasfiyekar, peyre jî min da pey pratîka kontrayî ya ku ji ber çepgiriya sektar pêk tê. Di vê pratîkê de, min hin kirin û tevgerên li dijî îdeolojiya Partiyê û rûmeta mirovahiyê meşandin. Min mezinahiya terza Serokatîyê ya li ser azadiya jinan fêm nekir û min bingeha terza UNÎTA'yê ya çeteyane danî. Li dêvla ku ez berê xwe bidim milîtanîya PKK'ê, min berê xwe da milîtanîya kesan. Li şûna tîkiliya hevrêtiyê, min tîkiliya latajo-

yan (ahbab-çavuş) û heremperestiyê danî. Piştî ku min pratîka xwe ya tasfiyekar naskir, min li hemberî Partî, gel û mirovahiyê xwe tawanbar hesiband. Bi taybetî li Girtîgeha Midyadê ez lê xebitîm, ku Partî û pratîka xwe çêtir analiz bikim. Li Midyadê de ez bêhtir biryardar û xwedan helwesteke zelal bûm. Li Konferansa, ku di meha avrêlê pêk hat de, min di rêveberiyê de cih girt. Hina jî ez di rêveberiyê de cih digirim. Tevî hewl û xebatan, di vê pêvajoyê de min pêwîstiyên şoreşgeriyê bi tîra xwe bi cih neanîn. Her çiqas ez xwedan taybetiyên ku li çîna min nakevin jî bûm, tu caran min xwe ji Partiyê cuda nehesiband. Dema li sala 1996'an dîsa xwestin we ji holê rakin, min dil kir ez çalakiyêke bi vî rengî pêk bînim, lê neçû serî. Min bawerî heye, ez dê vê carê bi ser bikevim. Ev çalakî, her wiha li kêmasî û şasiyên xwe jî rexnegirtin e.

Serokat roj e, em j rojgeran in

Navê min Aynur Artan e. Ez di sala 1974'an de li Elezîzê ji dayik bûm. Bi

eslê xwe, ez ji Çewlikê ji gundê Yeniköyê me. Malbata min xwedan taybetiyên feodal û birjuwaziya biçûk e. Ji ber aliyên malbata min yên welatparêz tîr negihîştibûn, min Partî di dema zanîngê de nas kir. Em sê bira ne. Ez biçûka malê me. Ji ber tesîra dîn û feodalîzmê, ez xwedî şexsiyeteke şermoke (içe kapanık) bûm. Berî ku ez Partiyê nas bikim, min bi tenê pirtûk dixwendin û alîkariya malbata xwe dikir. Lewre min dor li xwe teng kiribû. Ez bûbûm bengî û dilketiyê sistemê. Lê piştî wî min Partî nas kir, min bi bir bir ku, kemalîzmê em çiqas ker û gêj kirine. Lewma di roja 21 kewçêrê sala 1993'yan min dest ji zanîngê kişand û li Eyaleta Amedê tevî refên gerîla bûm. Min li Eyaleta Dêrsim û Erzeromê xebat kir. Di xebatên enî û artêşê de min wekî fermandarê deste(takım) û pelê(manga) kar gerand. Di sala 1996'an ez bo Qada Serokatîyê hatim şandin. Piştî perwerdehiyêke 6 mehî, vê carê bo xebatên metropolê, ez li Stenbolê hatim wezîfedar kirin. Lê min jiyanêke li gorî pîvanên Partiyê nemeşand.

Ez ketim taya tîkiliyên erzan yê sistemê. Ji ber bêtevdîriyê di roja 18 gulanê sala 1997'an de hatime girtin. Ev saleke li Girtîgeha Midyadê de karê nûnertiya qawîşê digerinim. Şexsiyeta min liberal û vasat e.

Serokê min! Ez, li gorî hewl û xebata ku Serokatîyê daye min, nemeşiyam. Gelek hevrêyên me, ji bo ku Serokatîya Partiyê bibînin, canê xwe gorî dikin. Ez wisa bawer im, min bi helwesta xwe ya di navberemayî (ortayolcu) keda Serokatîyê di avê de bir. Ez dê bi vê çalakiyê helwesta xwe ya ku dibêje "çênabe" be-revajî bikim.

Serokê min! Em dikarin êrîşên li dijî we, bi laşên ku dibin pengirên(kor) agirîn, tîk bibin. Serokatî roja me ya azadiyê, em jî rojgeranên(gezegen) li dora wê ne. Her rojgeran jî, pengirên ku ji agir vediqetin in. Em rizgarî û rastiya xwe di Serokatîyê de dibînin. Me dil heye, em bibin dilxwazên kampanyaya "Nikarin Roja Me Bêtav Bikin".

Em jina kevn j di ewit nin

Em bi vê çalakiyê jina kevnêşop û serdestiya mîr jî dişewitînin. Helwesta kevnêşop nehişt ku em Serokatîyê fêm bikin û em heya îro bi tiştên bêkêr mijûl bûn. Me xwe ji hestên şexsî neşûst û em di warekî teng de asê man. Lê Serokê min, me hay ji girîngiya ku Serokatîyê di de jinê heye. Em pê zanin, ji bo ku 'jin' bibe 'jin', divê bibe xwedan vîn û îrade. Ev tespîten hane, her ku diçe jinê bêhtir nêzikî azadiyê dike. Serokatî, ji rastiya YAJK, Zilan, Sema û Fikrî pêk tê û ev jî rastî bi xwe ye. Doktrîna Serokatîyê, cudahiya jin û mîran ji holê rakir.

Heya îro bi helwesta ku xwe ya ku dibêje: "Em fêm nakin, em nizanin." me da pey kevnêşopî û kesayetiya şkestî. Me aliyên xwe yên gundî û birjuwaziya biçûk li ser Partiyê kirin ferz. Me hem li gorî karîna û zanîna xwe kar nekir, hem jî me bi tîra xwe piştgiriya hev nekir. Li aliyê din dîtin û ramanên ku digotin: "Dem a du jin li hev rûnin, an dê hin kesan lome bikin an jî li hev werin." bi erdê re cûm bûn. Êdî dema du jin li hev rûdin li wê derê bedewî, azadî û jiyanêke nû peyda dibe. Em dê pêwîstiyên şoreşê, bi vî awayê jiyanê bi cih bînin.

Serokê me! Em vê kêliyê ji her kêliyê bêhtir xwe nêzikî we dibînin. Di vê kêliya ku, em amadehiya rêwitiya karwana şehîdan dikin, sebra me nayê, em dikin bibin çûka azadiyê û bifirin.

AYNUR ARTAN
SELAMET MENTEŞ
23.10.1998/MIDYAD

Selamet Menteş



Aynur Artan û Selamet Menteş roja 23 kewçêrê li Girtîgeha Midyadê ligel hev ji bo ku kompolaya li dijî Serokê Giştî yê PKK Abdullah Öcalan şermezar bikin, çalakiya xweşewitandinê pêk anîn.

□ 12.11.1993:

Osman Sebrî çû ser dilovaniya Xwe

Apê Osman Sebrî di sala 1905'an de li gundê Narinceya girêdayî ya Semsûrê tê dinê. Di deh saliya xwe de havê wî dimire û li cem apên xwe dimîne. Apên wî Nûrî û Şûkrî di dema Serhildana Şex Seîd de li Armedê têne dardekirin. Piştî wê Apê Sebrî û hevalên xwe dest bi şer dikin û tê girtin. Piştî sê salên zindanê tê berdan û di sala 1928'an de diçe Sûrî. Li dîwê hînbûn û nivîsandina kurdî di kovarên "Hawar, Ronahî û Roja Nû" de çîrok, helbest, serpêhalî, nivîsar û gotaran dinivîsîne. Apê Osman Sebrî 12'ê sermawezî di sala 1993'yan de diçe ber dilovaniya xwe.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ 11.11.1821:

Dostoyevskî ji dayik bû

Fiyodor Mihayloviç Dostoyevskî di sala 1821'an de li Moskovê ji dayik bû. Ew, dibistana leşkeriyê diqedîne û dibe serbaz. Ji ber dîtinên xwe yê siyasetê hate darizandin û berî ku bê dar de kirin, azad bû. Dostoyevskî ji aliyê rexnegîran ve di warê romana psikolojîk de wekî şarezatîrîn nivîskar dihesibînin. Lewre hin rexnegîr, wî, wekî psikolog bi nav dikin. Tawan û Seza, Birayên Karamazov, Gêjîk û Têbiniyên Ji Bin Erdê navdartîrîn romanên wî ne. Gelek romanên wî, bûn film û şano. Jiyanê Dostoyevskî têr şerpeze û şkestwar borî. Di meha reşemiyê sala 1881'an de çû ser dilovaniya xwe.

The Truman Show li sînemayan e Jiyana di bin kontrola keseke din de

Gelo insan bibin Xweda wê çi bibe? Ango yek jiyana mirov ji bûyîne heta dawiya temenê mirov kontrol bike û li gorî xwe bi rê ve bibe wê çi bibe?

Em qala filmê 'Truman Show' dikin. Derhênerê wî filmî Peter Weir e û bi slogana: "Her kes li wî temaşê dike, lê ew bi vê nîzane" reklamê film hatiye kirin.

Di film de her kes li jiyana Truman (Jim Carrey) temaşê dike lê Truman heta demekê dirêj bi vê rewşê nizane. Zilamêkî jiyana Truman ji dayikbûna wî standiye û ji dayikbûna wî, zarokatiya wî û heta mirinê, bi çar hezar kamareyan kişandiye û bi awayekî zindî nîşanî gel dide û gel bîst û çar saetan li ber televîzyonên xwe li Truman temaşê dike.

Berî her tiştî mirov dikare bêje ku dekorek gelek baş û bi serketî di film de bi kar anîne û aktorên jî rola xwe baş leystine. Dîsa di film de mirov dikare şerêkî ku ji bo serkeftinê tê dayîn, bibîne. Di film de ji serî heta dawiyê dixwazin Truman li gorî xwesteka xwe bidin meşandin û Truman jî dixwaze ji vê jiyandê derkeve lê çî gavê diavêje astengiyan derdixin pêşiya wî.

Bi awayekî giştî em dikarin bibêjin ji bo jiyana Truman giravêk û di giravê de jî insanên ku dijîn amade kirine û rol dane wan.


Truman li Bankayê dixebite. Ji ber ku her kes wî nas dike gava ji mal derdikeve her kes rojbaşê dide wî. Lê yek jê re dibêje: "Ger em hev û din nebînin 'beyanîbaş, rojbaş û êvar baş.' Ev ji Truman re ecêb tê û dibe gaveke pêhesîna ku her kes li dijî wî ye û her kes li jiyana wî temaşê dike.

Truman her gav ji bo xelasiya xwe gavan davêje. Li erebeyê siwar dibe ku ji wê jiyandê derkeve, astengiyan derdixin pêşiya wî, diçe ku bilêtekê wê bikire û wê giravê terk bike û biçe, jê re dibêjin: "Mehekê bilêk tunene" rê li ber digirin.

Ligel ku di despêkê de film bi mirov xweş nayê jî gava ku mirov lê sor dibe hinek xweş tê û her diçe bi mirov xweştir dibe. Di navbera film de televîzyonek bi zilamê ku jiyana

Truman bi rêve dibe re, hevpeyvînekê dike. Di hevpeyvîne de mirov dibêje: "Bi rastî, ger Truman bixwaze ji vê jiyandê derkeve û biçe jiyaneke din, ez ê destûr bidimê" Lê Truman çawa dixwaze ji vê jiyandê derkeve, astengiyan derdixe pêşiya wî.

Truman ji keçîkekê hez dike û demekê li



ber behrê tîne cem hev lê ji ber ku naxwazin Truman ji xwesteka wan derkeve, tîne bi zorê keçîkê ji dest Truman derdixin û dibin. Truman li keçîyekê siwar dibe û derdikeve ser behrê. Ew dixwaze ji vê jiyandê rizgar bibe. Zilamê ku dixwaze Truman li gorî xwesteka wî bijî, di nav behrê de jî astengiyan derdixe pêşiya wî. Zilam wekî xwedayekî tevdigere. Hemû tevgerên meteorolojîkî jî di bin destê wî de ne. Her çiqas bi vê riyê di nav behrê de jî astengiyan derdixe pêşiya Truman, Truman biryar daye ku ji vê jiyandê xelas bibe û li gel ewrên çêkirî, bagerên çêkirî yê di nav behrê de, Truman riya xwe didomîne.


Dawiya, dawî keştiya Truman tê li dekorê dikeve. Di wir de rêveberê jiyana Truman bi Truman re dest bi hevpeyvîne dike. Dibêje: "Truman, jiyana ku tu diçî ji vê jiyandê ne baştir e, neçê!"

Ger Truman biçe serkeftina Truman e û tîkçûna jiyana çêkirî ya zilamê ku xwe xwedan dihesibîne ye. Truman diçe. Digihêje serkeftina xwe.

C. ANDOK / STENBOL

ÇAVDÊRÎ

Nîqaşkirina romanên kurdî



MÎRHEM YÎÇIT

Salên dawî hinekî bûne salên jidayikbûna romana kurdî. Ev pêşketinek e, dilê mirov pê xweş dibe. Di zemanekî ku dinya biçûktir bûye de, haydariya li ser edebiyata neteweyên din qet bi sedsalên buhurî re muqayese nabe û mirov dikare bi hêsanî nas bike ka li kîjan welatî pêşketî çend romanên nû derdikevin. Ev guhartin hinekî be jî bêhna mirov derdixe.

Li welatê giş şaxên edebî girêdayî rewşa şoreşê û derece û nisbeta siyasîbûna gelê kurd, dikarin bi pêş bikevin. Li tu der û tu deveran berdewamiya jiyana fikrî, hunermendî û rewşenbîrî ew çendî bi berxwedana çêkdarî ve nehatine girêdan. Her mirovekî bîrbir dikare bi bibîne û ji bo dîtina wê jî hinekî fikirîna diyalektîkî bes e.

Heta berî niha bi 15-20 salan çend îstîsna ne tê de, kurdan bi şeweyekî giştî helbest dinivîsandin û ew jî bi piranî klasîk û bi kafiye bûn. Îro dinyaya edebî girêdayî rewşa siyasî û hişyariya giştî zindîtir û dewlementir e. Di vê eniyê de jî diyarde û berjengên çonaxeke berzîr berbiçav dibin, gavên nû xuya dibin û mirov pê dihesa ku lebatek heye.

Zêdebûna hejmara romanên û qelemên xort û nû di wî aliyê de, bi xwe re hewcedariya bi rexnegiriyê jî tîne. Lewre roman û rexnegîrî hevalcêwiyên hev in, bê hev nabin, yek ya din dixwaze, li dû hev tîne.

Ev li dora pênc mehan e ku em hejmarek nivîskar û edebiyathez, em romanên kurdî munaqêşe dikin û hewl didin ku wan binirxînin. Ev ji bo xwe bêjim, ev karekî zêdeyî texmînan xweş û bikêl e. Cara ewil piştî van munaqêşeyan ez bi çêjeke pir xwesertir û bi heyecaneke ji ya heta niha cihêtir romanên kurdî dixwînim. Ez îro jî berî niha bi çend mehan zêdetir hez ji romanên kurdî û xwendina romanên bi kurdî dikim. Ne ez bi tenê, li dora hevalên din jî ez vê pêjnê dikim, ew jî dibêjin xwezî me berî niha bi salekê dest bi wî karî kiribûya û me ev gelek zûtir damezirandibya.

Ez dikarim bêjim ku niha, dema me munaqêşkirina çar romanên li pey xwe hiştîye û hîna (6/11/1998) em dê romana pêncemîn 'Dimdim' ku ya Erebe Şemo ye bikin dabaş, ji kêfan re lingên min erd nagirin û carina mîna zarokan li min tê, tebata min nayê. Romanên heta niha me munaqêşe kirin, bi tîpên latînî ne û giş li derveyî welat hatine nivîsandin, yek ne tê de yê mayî li Ewropa hatine çapkirin.

1. Sorê Gulê-Silêman Demir. 2. Pêlên Bêrîkirinê-Mustafa Aydoğan. 3. Labîrenta Cinan-Hesenê Metê. 4. Bîra Qederê-Mehmet Uzun. Xwendevan zanin ku romanên bi tîpên latînî hatine nivîsandin û îro di kitêbxaneyên kurdan de pêde dibin ne zaf in. Xwendevanekî baş dikare di nav çend deqîqeyan de navê hemûyan bihejmêre. Mirovek dikare wan tîpê torbeyekî û li nav milê xwe bike. Ewçendî hindik in. Me dil heye bê ferq û cewazî em van romanên giştî munaqêşe bikin û binirxînin. Helbet li derveyî van hin romanên hêja, belê bi tirkî, bi farisî, bi erebî yan jî bi zaravayên din ên kurdî jî hene ku hêjayî xwendin û nirxandinê ne. Belê niha di listeya xelesa rexnegiriyê de bi tenê romanên bi kurdî û bi tîpên latînî hene.

Munaqêşeyên romanên bi rengê kasetên teybê li Înstîtuya Kurdî ya Stokholmê têne arşivkirin. Em dê hewl bidin ku li pêşerojê, van berhemên munaqêşeyî bikin kitêb an jî bi awayê hejmarên taybetî yê Avaşîn çap bikin.

Cumhuriyet meş

Birê: Kaplan, Serokê Dadgeha Bilind ya Tirkîyeyê got: "Li Tirkîyeyê dazgerî ne serbixwe ye". Lê Süleyman Demirel jî got: "Berhema herî mezin a Cumhuriyetê dewleta hiqûqê ye". Em baweriya xwe bi kê bînin?

□ İro Serokê vê komarê dibêje: "Tirkîyeyê dewleteke hiqûqê ye". Divê dewlet bi her awayî 75 salan binirxîne û hesabê xwe bike. Lê dewlet vê yekê nake. Dewlet li şûna vê yekê giraniyê dide şovenizm û mîlîtarîzmê. Di nav 75 salan de dewleta hiqûqê derbeyên mezin xwarine. Niha Qanûna Bingehîn a 1982'yan li ser kar e. Mafya û çeteyan dest avêtîyê karûbare dewletê. Siyasetmedar û rayedarên dewletê bi endamên mafya û çeteyan re ittîfaq çêkirine. Lewre mafyaya li Tirkîyeyê jî mafyaya cihanê cuda ye. Mafyaya cihanê eroîn-firoşî, zevîfiroşî û karên hwd. dike. Lê li Tirkîyeyê siyasetmedar, rayedarên dewletê û çeteyan dest dane hev. Li aliyekî mirov kuştine û li aliyekî jî ji bo ku bibin iktidar dest avêtine karê dewletê. Bo nimûne li Tirkîyeyê mafyaya çek û senedan cihê dadgehan girtiye. Ji ber ku dadgehên li Tirkîyeyê nekarîne problemên mirovan safî bikin, mafyaya çek û senedan ev kar meşandiye. Wekî xuya ye dewlet jî aliyê huquqî ve negihîştîye qonaxeke baş. Her wiha di warê aborî, siyasî, tendurîstî û perwerdehiyê de jî cumhuriyet nehatiye qonaxeke baş. Nûnerên gel li meclîsê tune ne. Lewre meclîs îradeya gel temsîl nake û bo çavan e. Wekî din Cumhuriyetê di nava gelan de biratî û aştiyek dananiye.

Nexwe cumhuriyet di sinifê de ma?

□ Ez nabêjim di sinifê de maye. Dema Atatürk bingeha Cumhuriyetê danî wiha got: "Divê em xwe bigihînin qonaxa welatên hemdem." Wê demê dewlet li ser esasa netewe dewletê (ulus devlet) hate avakirin. Lê ev polîtîka, li rewşa Anatoliyayê nedihat. Lewre împaratoriya Osmanî pîmetewe û pirçand bû. Dawiyê kurd û tirk mam. Dema cumhuriyet hate danîn, wekî Cumhuriyeta kurd û tirkan hate binavkirin. Lewma Tirkîye nehatiye noqteya ku heq dike. Bi kurtayî Tirkîyeyê sparteya (ödev) xwe baş pêk neaniye. Lewre di her warî de kêmasiyên wê hene. Tirkîye di çend dersan de li îkmalê maye. Ev ders jî, meseleya kurd, mafên mirovan, demokra-


si û dewleta huquqî ye. Divê baş lê bixebite.

Tirkîye jî ber şerê li Kurdistanê di warê aborî, siyasî, dîplomatîk û mafên mirovan de ketîye nava tengasiyeye mezin lê dîsa jî şerperestiyê dike. Gelo Tirkîye piştî xwe bi çi ve girêdide?

□ Li Tirkîyeyê karûbare dewletê MGK û "Dewleta Nehênî (Derin Dewlet)" digêrin. Meclîs, hukûmet û siyasetmedar ne xwedî tu îrade û desthilatê ne. Divê mirov baş li tevgerên "Dewleta Nehênî" binihêre. Wekî xuya ye, li aliyekî wekî ku tu tişt çênebûye diaxivin, li aliyekî jî dewlet kêmaniyên xwe bi bir dixe û lê dixebite ku van kêmaniyên safî bike. Ev du sal in dewlet xebateke mezin di nava xwe de dike. Haya kesî zêde jî vê xebatê nîn e. Wezîrê Karên Derve yê Tirkîyeyê li ser mafên mirovan raporek girêda. Ev rapora hane 60-70 rûpel bû. Di vê raporê de îhlalên mafên mirovan bi tîra xwe hatibûn nivîsîn. Tiştên ku me digot, hatibûn diyarkirin. Piştî vê rapora navborî, ev du sal in, di bin serokatiya Wezîrê Mafên Mirovan Hikmet Sami Türk de Heyeta Rajorîn ya Mafên Mirovan xebatê dike. Ev xebat carina tê rojê medyayê jî. Bo nimûne ev heyeta hanê dibêje, ew dê Qanûna Memûrîn Muhakemat û OHAL'ê rakin û her wiha nizamnameya îfadeyê derînin û hwd. Niha gelek pêşnûmayên (tasarı) qanûnê li meclîsê ne. Dema ev bibin qanûn, dê Tirkîye jî vê şermezariyê rizgar bibe. Wekî min got, dewlet li aliyekî hişk diaxive, li aliyekî jî vê xebatê dike. Ev xebat gelekî girîng e. Bo nimûne dema Qanûna Memûrîn Muhakemat bê guhartin, wê polis û memûrên din yê dewletê bi hêsanî werin mehkemekirin. Li aliyê din tu rê li ber Tirkîye nîn in. Lewre Tirkîyeyê berê xwe daye Ewropayê. Aliyekî dewletê doza hiqûqê û mafên mirovan dike lê mîlîtarîzm û "Dewleta Nehênî" rê li pêşiya van kesan digirin. Bi tenê sazî û rêxistinên sivîl dikarin rê li pêşiya van kesan vekin.

We got dewlet kêmasiyên xwe dibîne. Li aliyê din jî bo agirbesta yekalî ya PKK'ê tu gavên pozîtîf neavêje û beravajî vê yekê şerperestiyê dike?

□ Ev zaafêke mezin e! Riya vê nabîne. Dewlet dide zanîn, ew bi rêxistineke



HASIP KAPLAN, herçend jî bo dozên DİSK, TÖBDER û Barış Derneği (Komeleya Pîsî Pêdanexwarinê (Yeşilyurt Dışkı Yedirme Davası) hate nasîn. Kaplan, di sala 1954'an Stenbolê Beşa Hiqûqê xwendîye. Her wiha wî di doza DEP û Jina İzlandî de ebûqatî kir. Niha bi navê "Ji Stenbolê Heta Botanê Notên li Ser Rewşa Awarte" û "Şerekî Rûmetê: Do hatine weşandin. Di gelek dozê girtiyên PKK'ê û rêxistinên din yê kurd de ebûqatî kariye. Piştî ku demeke dirêj di nava SODEP û SHP'ê de xebat kir, derbasî DEP'ê bû. Hem rêxwezî giraniya xwe da karê ebûqatî yê. Li gorî gotina wî, niha li AİHM'ê li ber destê wî 315 doz

nehênî û serokê wê re li hev rûnane. Di vê noqteyê de jî her tişt xitimîye. Divê riya vê yekê bê vekirin. Dema rê bi dewlet û rêxistinê venebe, divê bi riyên din vebe. Divê partî, komele, rewşenbîrên vî welatî riyên din peyda bikin. Meseleyên wekî meseleya kurdan, li Spanya, Filîstîn û Îrlandayê çûn serî. Çima li Tirkîyeyê, kurd û tirk digel ku ev hezar sal e bi hev re dijîn, aşî pêk neyê? Divê mirov bi du aliyên ve li vê pîrsê bikole. Yek, çareserî li berjewendiyên welatên biyanî nayê. Lewre nexwazin Tirkîye bi pêş bikeve. Li aliyê din aligirên "Dewleta Nehênî" jî vî şerî rant û berjewendiyên mezin bidest dixin. Lewma bi tenê ew kes aştiyê naxwazin. Kê aşî divê? Ez karim bi rehetî bêjim, li Tirkîyeyê bi tenê 500 hezar kes meşandin vî şerî dixwaze. Problem di nava me de ye. Divê problem di nava sînoren Mîsakî-Mîllî de bê safîkirin. Kurd û tirkan hêz û quwet heye.


Baş e. Rayedarên Tirkîyeyê dibêjin: "Em digel rêxistineke nehênî rûnanin."

Lê dewlet pêşiya alternatîfên legal, bo nimûne HADEP'ê jî, digire. Gelo alternatîfên dewletên hene?

□ Bi baweriya min alternatîfên dewletê zaf in. Li cihanê meseleyên bi vî rengî bi qasîdan diçin serî. Li Filîstînê cihû û Yaser Arafat li hev hatin, dîsa serokwezîrê Îngîlistanê Tony Blair û Serokê Sein Fein Gary Adams li hev rûniştin. Jixwe li her derê meseleyên wiha bi vî awayî safî dibin. Li Tirkîyeyê jî divê em vî riyê peyda bikin. Bi baweriya min hilbijartinên li pêşiya me, ji bo Tirkîyeyê fersendeke mezin e. Divê nûnerên kurdan di meclîsê de cih bigirin. Her wiha divê hilbijartinên deverî (yerel) de jî gel nûnerên xwe bi serbestî hilbijêre. Dê meclîsa pêşiya me muhatabê vî karî be. Lewre ev hilbijartin zêde girîng in. Ji ber ku hem giştî hem jî deverî ne. Di meseleya kurd de dê bêhemdî xwe rê vebin. Lewre Cumhuriyet bûye meşkeke qulqulî. Ev meşk bi darik girêdanê çênabe. Lewma jî divê ev meşk bê guhartin û meşkeke nû bê peyda kirin.

Hilbijartinên li pêşiya me jî bo dewletê firseteke mezin e. Dê meclîsa nû muhatabê vî karî be. Ev hilbijartin zêde girîng in. Ji ber ku hem giştî hem jî deverî ne. Di meseleya kurd de dê bêhemdî xwe rê vebin. Lewre Cumhuriyet bûye meşkeke qulqulî. Ev meşk bi darik girêdanê çênabe. Lewma jî divê ev meşk bê guhartin û meşkeke nû bê peyda kirin.

Er Hasip Kaplan: Eke qulqulî ye



Parêzî kiribe jî pêşin bi "Doza Yeşilyurt ya
xê (IDIL) ji dayik bûye. Wî, li Zanîngeha
damê Yekitiya Parêzerên Ewropayê ye. Heta
urt ya Pîsi Pêdanexwarinê" du pirtûkên wî
din Hasip Kaplan bi karûbarê siyasî jî rabû.
n jî parêzeriya DEP'ê kir. Piştê jê veqetîya û

*We got, divê mesele di nava sînorên
"Misak Milli" de bê çareserkirin. Lê îro
gelek pisporên tirk jî dibêjin kêşeya kurd
li Bakur bêyî başûr naçe serî.*

□ Ev tiştêkî din e. Jixwe li cihanê glo-
balîzmê rû daye û hemû problem li hev
hatine girêdan. Her wiha meseleya kurd
li Îran, Iraq û Sûriyeyê jî heye. Dîsa Ne-
teweyên Yekbûyî û Ewropa jî li ser me-
seleyê radiweste. Ji ber vê yekê meselaya
kurd meseleyeke cihanî ye. Ne ku em bi
vê yekê nizanin. Ev dê bêguman tesîrê li
hev bikin. Lê pêşin divê mirov meseleyê
di nava mala xwe de safî bike, piştê der-
keve hewşê piştê jî bajêr. Bi planên îthal
ev mesele safî nabe.

*Lê artêşa Tirkîye li Rojhilat û Başûrê
biçûk li dijî kurdan şer nake. Rewşa Ba-
şûr ne cihê ye ma?*

□ Ev rast e. Ev noqteyêke din e. Îro
DYA jî bang li Barzanî û Talabanî kir û
vê yekê tesîr li Tirkîyeyê jî, li kurdan jî
kir. Nirxandina vê yekê noqteyêke mezîn

Rayedar wekî ku tu tişt çênebûye diaxivin, lê li
alîyekî jî dewlet bîr dide kêmaniyên xwe û lê
dixebite ku wan safî bike. Ev du sal in di nava
xebateke mezin de ye. Wezîrê Karên Derve yê
Tirkîyeyê li ser mafên mirovan raporek girêda.
Di vê raporê de îhlalên pêkhatî hatibûn nivîsîn.
Lê Dewleta Nehênî rê li ber vê yekê digire.

e. Jixwe hemû mesele têkilî hev in. Mi-
rov ewil çî dîke? Pêşin agirbestê îlan di-
ke piştê aştîyê datîne, peyre jî meseleyan
li ser masayê rêz dîke. Her wiha divê bê
zanîn meseleya kurd yekcar safî nabe.
Mesele dê 50-60 salan bidome. Lê pêşin
divê rîknê aştîyê bê danîn.

*Em hinekî jî li ser rewşa HADEP'ê
rawestin. Dewletê li alîyekî rayedarên
HADEP'ê serbest berdan li alîyekî jî ne-
hişt Murat Bozjak bikeve Amedê. Ev
helwest nîşaneyê çî ye?*

□ Îro HADEP li herêmê partiya herî
mezin e lê nahêlin serok û rayedarên wê
bikevin herêmê. Kê nehişt? "Dewleta
Nehênî" nehişt HADEP bikeve Amedê.
Divê bûyerê de meclîs jî bêtrade ye û ha-
ya wê jî bûyerê nin e. Meclîs radize.

*Gelo "Dewleta Nehênî" nedikarî rê li
ber serbestberdana rayedarên HA-
DEP'ê bigirta?*

□ Dikare lê li hesabê wan nayê. Ew pê
dizanin ku tiştên ku dikin ne hîquqî ne.
Lê dikin, bîminetî dikin.

*Wekî xuya ye salvegera "Bûyera Su-
surlukê" ye. Di vê navê de gelek çete
peyda bûn. Gelo civaka tirk hinî çeteyan
bûye? Lewre mesele hîna jî neçîye serî.*

□ Îro çete û mafya ziyane digihînin
hemû civakê. Lê ji ber ku li meclîsê, yên
ku têkilî bûyera Susurlukê bûne, ji yên
din xurtir in, ev mesele neyê safîkirin.
Dema tu xwedî hêza quwet bî, tu dikarî
meselêyê safî bikî. Bo nimûne, li Span-
yayê GAL'ê wekî çeteyên li Tirkîyeyê,
tevî polis û siyasetmedaran mirov kuştin
an jî windakirin. Lê dawiyê bi piştgiriya
gel û medyayê ev kes hatin mehkemeki-
rin û îro wezîrê karê hûndirin yê wê demê
di girtigehê de ye.

*Gelo beşeke mezin ji gelê Tirkîyeyê
van çeteyan normal nabîne? Wekî bêje
van kesan li dijî terorê xebat kiriye û ki-
rinên wan bi heq in?*

□ Gelê Tirkîyeyê di serî de digot, ew
kes jî bo welat û mîlet şer dikin. Lê niha
têgihîştîye ku ew kes karên qirêj dikin û
bo berjewendiyên xwe dixebitin.

*Ev sezdeh sal in we gelek aliyên şer
bi çavê serê xwe difîne. Hûn dikarin vê
pêvajoyê binirxînin?*

□ Li sala 1984' an min li Hezêxê (Î-
dil) ebûqatî dikir. Berî ku PKK'ê dest bi
şerê çekdarî bike jî, li ser gel zilm û zore-
ke xedar di hate meşandin. Pêşîya têkoşî-
na demokratîk bi her awayî hatibû girtin.
Ji bo xweifadekirinê tu rê û rêçik nema-
bûn. Lewre şertên têkoşîna çekdarî peyda
bûn. Tesîra vî şerî bi awayekî berfireh li
Tirkîye û cîhanê bû. Mirov bi her awayî
guherîn. Tiştê herî girîng, mirov hişyar û
zana bûn. Ger te bi hezaran konferans û
semîner bidana û pirtûk bi mirovan bida-
na xwendin, bi vî awayî zana û hişyar ne-
dibûn. Zarokên ku nû çêdibin, tevî meşan
dibin û bi gelek tiştan dihesin. Li aliyê
din tevahiya kurdan jî vî şerî tade dît. 3
hezar gund hatin valakirin û kurd jî cîh û
warên xwe bûn. Ev bîst sal in li herêmê
rewşa awarte li dar e. Dawiya dawî mese-
le niha hatiye noqteyêke gelekî kambax.
Divê teqez bê safîkirin. Nexwe dê ji ku û
çawa biteqe, diyar nabe.

*Li şerê ku li Kurdistanê tê meşandin,
li dijî mirovahiyê gelek sûc hatin kirin.
Dê ev suc rojekê li "Dadgeha Sûcdarên
Şer" bîn mehkemekirin?*

□ Wekî tê zanin, roja 15 pûşperê
1998'an li Romayê, di bin banê Nete-
weyên Yekbûyî de "Dîwana Adaletê ya
Cezayê ya Navneteweyî" li hev civiya.
Nûnerên 165 dewletên û rêxistinên sivil 5
heftan li ser sûcên li dijî mirovahiyê pe-
yivîn û piştê wan biryar girt ku mehke-
meke wilo bê avakirin. Ev mehkeme ne
wekî Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewro-
payê (AIHM) herêmî ye, mehkemeke cî-
hanî ye. Lewre girêdayî Neteweyên Yek-
bûyî ye. Sûcên ku li Bosna, Kurdistan û
Kosova hwd. hatine kirin, dê werin meh-
kemekirin. Ji Fransayê pê ve Tirkîye jî di
nav de 50 dewletan avakirina vê mehke-
meyê qebûl kir. Wê tesîra vê mehkemeyê
zêde mezin be.

*Îro di warê hiqûqê de jî sazîyên kur-
dan tîr avakirin. Bo nimûne, Yekitiya
Hiqûqnasên Kurdistanê. Têkiliya bi
wan re çawa ye?*

□ YHK, li Ewropayê hatiye avakirin
û li gorî şertên wê derê kar dîke. Têkiliya
wê bi Tirkîyeyê re tune ye.

MAZLÛM DOĞAN

"Rayedar di nava xwe de
rastiyê dibêjin"

*Diyar e hûn derdorê bürokratik,
rewşenbîr û artêşê baş nas dikin? Gelo ev
kes li ber televîzyon û di nava xwe de
wekî hev dipeyivin?*

□ Ev kes, li ber medyayê rastiyê diyar
nakin. Lê dema li hev rûdinin, dibêjin:
"Divê meseleya kurd safî be û agirbest bê
îlankirin." û hwd. Ev tespîten ku di nav
xwe de dikin, bêhtir di cih de ne. Min jî
sala 1983'yan heta 1992'yan li Hezêxê
karê ebûqatîyê kir lewre ez bi van tiştan
baş dizanim

*Dîsa hûn di nava derdorekî kemalist
de jî mane. Îro gelek derdor kême be jî li
ser meseleya kurd li xwe mikur tîr, lê
kemalist doza sala 1930'yan dikin?*

□ Ev kesên ku dibêjin em kemalist in,
çima behsa gotinên Atatürk ên li ser kur-
dan nakin? Ev gotin di belgenamêyên
Meclîsê de cih digirin.

Ma gotinên Atatürk ji dil bûn?

□ Li gorî wê demê wilo pêwîst bû.
Pêşin Atatürk bi kurdan re bi rê ket.

Ma ev rewş tiştêkî normal e?

□ Ev şerm û eyba sedsala bîstan e.

*Lê ji bo ermen û cîhûyan heman
polîtîka nehatiye meşandin.*

□ Na. Ji bo suryaniyan jî polîtîkaya
asîmilasyon û înkarkirinê hatiye gerandin.
Jixwe wekî diyar e maf neyên dayin tîr
standin. Tu riyên din xuya nakin.

*Hûn endamê Yekitiya Parêzerên
Ewropayê ne. Hûn helwesta ewrûpiyan
ya li ser kurdan çawa dinirxînin?*

□ Rewşenbîr û siyasetmedarên ewrûpî,
li ser meseleya kurd jî dil hareket nakin.
Ger ji dilbûna, dê mafê gelê kurd bidana.
Ji ber ku belge û pîvanên Konseya
Ewropayê û Neteweyên Yekbûyî mafê
mîletên bindest didinê. Tirkîyeyê jî ev
peyman hemû îmze kirine. Lê Ewropa jî
bo ku meseleya kurd safî bibe, zorê nade
Tirkîyayê. Tiştên ku dibêjin jî, ji bo ku
kurd neçin welatên ewrûpî, dibêjin.
Ewropa di vî warî de zêde zêde durûye.
Di nav ewrûpiyan de dost hene lê kêmin.

*We heya sala 1991'ê di nava SHP de
xebat kir. CHP li ser kurdan xwe jî par-
tîyên din demokratîk dide xuyakirin. Gelo
wisa ye?*

□ Min di navenda giştî ya SHP'ê de
xebat kiriye. Ez 8 salan bi awayekî aktîf
xebitîm. Ez İnönü û Baykal baş nas dikim.
Lî ser meseleya kurd jî her kesî zêdetir
rapor nivîsîn, lê mafên mirovan jî
herdemê bêhtir, di dema wan de hatin
îhlalkirin. Felaketên mezin di dema
koalîsyona SHP-DYP'ê de pêk hatin. Bi
baweriya min li Tirkîyeyê sosyal
demokrat vakayên klînik in. Carina xwe
nêzikî kurdan dikin lewre serketinên
mezin bi dest dixin. Baykal çiqas biçê
Sêrtê û bêje "Biborin" bi kêrî tiştêkî nayê.

Meşk ji çermê min, dew ji rondikên te: Rûnê azadiyê bi ser dikeve

Xwîna min li eniyê deqeke gevez dimîne roja serfiraziyan

zivistan
berf dibare li Kurdistanan
ji bo bînpê nebin kuliyên berf û dil-beran
li qadên pîroz
helbestavanekî dîn qeyd dike cot bi cot piyên reş ên hemû mirovan

zivistan
siya sêdaran dirêj dibe, dibare li Kurdistanan
meşk ji çermê min, dew ji rondikên te
rûnê azadiyê bi ser dikeve

Ez neviyê êgir im

Ez moz û kêzên laşan nîn im
Ez mişk û dizê aşan nîn im
Ez pîsî û nexweşiya meşan nîn im
Ez pêt û pilotiyên çavan me

Ez kêr û xwîna kulan nîn im
Ez pîrhevokên mêjî û dilan nîn im
Ez sewta şêx û melan nîn im
Ez neviyê Medan û Kawa me

Ez ziroyê newal û kaniyan nîn im
Ez tarî û siya xaniyan nîn im
Ez kujer zarok û diyan nîn im
Ez keskasora xewn û xewa me

Min hemû girtiyên di mêjiyê xwe de şewitandin

Min hemû girtiyên di mêjiyê xwe de şewitandin
Bi kolonyake bêhntirş...
Bi hişyarbûna ziman-zuhabûneke nivê şevê
Wisa jî tî bûbûm ji bo azadiyê
Paçekî şil bûm ku dîsa êgir lê dida û
Ta bi ta reng bi reng rabûbûm dîlanê

Min hemû azadiyên di dilê xwe de jî şewitandin

Ku li zozanan bi minminîkan re hevaltî kiribûn
Li asta jorîn bi zinaran re û
Di qayiş û berberiyên de
Ku meydan ji kesî re nehiştibûn..

Min hemû bêdengiyên mirovan jî bi xwe re şewitandin...

Bêqurtî û bêgotin...

Û ez rebenê Xwedê
Çavên xwe li pênuşê digerinim
Ji bo jana dilê xwe vereşinim
Lê
Ez êdî ji helbestvaniya xwe jî fedî dikim....

ŞÊXMÛS SEFER

Bêrî

Awirên hezkirina te hênik dike agirê nava dilê min
wê kengî bîn wê kengî bîn
ew rojên vekirina wan dergehên dîrokê
bêje kanî ew rojên min û te yên wînda,
yên ji evîna dilan û ji mijgulên çavan nêzîktir,
wê kengî bê jibîrkirin
ew dema ku dûmana êgir li ser singa te belav dibû û tarî dikir,
her deverên xaka Mezopotamya,
roj wê bê ku vebin goristanê can-goriyên nemir,
bi destên hinekirî,
yên ku qalikên fişekên vala, nedi-girtin.
wê vebin
ew guhên xetimandî yên ku nabi-hîzin
dengê zare-zar û vizeviza guleyan,
wekî pîzotên argûnî xwe berdidan bi

newalan de,
ji bir nekin ji bir nekin
ew çax bû,
gava ku dilê min hezkirina jiyane diparast,
ew destmala neqîşkirî li dora ser lêvên te rûniştibû,
ya wek pirtûkê,
pirtûka pîroz ku dihate parastin
ew çax bû,
dema hêstiran xwe bi ser hinarkên ruwan de berdidan
roj wê bê ku her yek ji wan dilopên hêstirên çavan
bibin stêrên di nava ewrên tarî de
wê ronî bidin li ezmanan
wê bibin gul, sosin û nêrgiz
mîna şitlên rihane ku li qeraxa çeman rehên xwe berdidin nava erdê,
roj wê bê
ew dê bibin hêviya hawara bûkên serbixelî û dayikên reşgirêdayî
I. CAN DILBİRİN

Di hevoka welatê min de

Di hevoka welatê min de
lêker
êş, jan
mirin
koçerbûn
û berxwedan e.

Di hevoka welatê min de
rengdêr
zerka mirinê
tariya şevê
agirê gundên şewitî ye.

Di hevoka welatê min de
bireser
ax bireser
Efrîn
Mehabad
Amed...seranser
Kurdistan e.

Kirde
Tirk
Ereb
Faris û
împeryalistên destbixwîn in.

Lê noqte tegez
rojên têr azadî
rojên bi berhem û
serxwebûn in.

BERKEN BEREH



bi her kilbûna sîfik sîfik a terman re

zivistanan
berf dibare li Kurdistanan
hêviyên qelew pêşnûma dikim
di dahatûyan de
dê ji xwîdanê bifetise di destê min de
destê destgirtiyên

zivistan
bêhna goştê şewitî, laşê kizirî dibare li Kurdistanan
ji 99 navên êşun dibin navek
navên pilingên pereng ên ku xwe dikin ardûyê êgirên

zivistan
xwîna bekarêta qîzan dibare li Kurdistanan
û namûs virnî dizê
û rûmet cewî dizê
komkujî bi komkujî em ber bi komaran ve diçin

RÊNAS JIYAN

Ez êş û jana bawiyên nîn im
Ez dev û didanê hovan nîn im
Ez ker û korê dawiyên nîn im
Ez ronî me, ax im, av im, hewa me

Ez şivanê dûvpişk û maran nîn im
Ez fermandarê dîn û haran nîn im
Ez spî û kurmê kewaran nîn im
Ez bijîşkê doz û dawa me

Ez toz û talaza şev û xewan nîn im
Ez kef û gilêza xof û xezeban nîn im
Ez melkematê berzewac û ezaban nîn im
Ez dergûşa şarezahiyê me, ne qewmê kewa me

Ez dîroknasê nokerî û bênamûsiyê nîn im
Ez navnişana qirêjî û pîsiyê nîn im
Ez bermahiya tirkî û erebî û farisî nîn im
Ez fermanberê serokê roja şeva me

ÎLHAMÎ ÖZER

Navenda Çanda Mezopotamya ya İzmirê

● 07.11.98, şemf: Konferans:

"Tyatroyeke çawa"- Özdemir Nutku, saet: 18.00

08.11.98, yekşem: Konsera Koma Agirê Zerdest "Ax lo", saet: 18.00

● 11.11.98, çarşem: Konferans:

"Ji Şoreşa Kewçêrê ta roja îro"- Abdurrahman Taşdemir, saet: 18.00

● 13.11.98, m: Sohbet:

"Li Ser Dicle Hiv Xuman e." Şükürî Erbaş, saet: 18.00



YÇKM

● 08.11.98, şemf: Bi zimanê huner Mirov û Cıvak-2 (Felsefevanê Komediya li Serpiyan Philos-Up. Pêşkêşvan: Nazif Uslu. Beşdar: Zeki Taş, saet: 14.00. Konsera Koma Amed, saet: 17.00

Navenda Çanda Tohum

● 07.011.98 şemf: Sînemaya zarokan: 'Kralê Şêr', saet: 15.00. Fîlmê Protesto, saet: 17.00

● 08.11.98 yekşem: Bîranîna Enver Gökçe. Beşdar: Ayşe Emel Mesçi-Mehmet Özer, saet: 15.00

Sansûr û

helwesteke grotesque

Her wekî sansûra li ser rojname û kovaran, sansûra li ser weşana amûrên dîtarî û bihîstyarî jî ji mêj ve tê zanîn. Weşana radyoyên demokrat ên mîna Radyo Karacadağ, Çevre Radyo, Özgür Radyo, Radyo Arkadaş û Metro Radyo û hinekên din bi biryara RTÜK'ê hatin girtin. Sedema van sansûran siyasî bû, lewre jî ji bilî çend sazîyên demokratîk deng ji kesî derneket.

Sansûra RTÜK'ê bi radyoyên demokrat bi sînor nebû. Ji mêj ve ye her roj li ser ekranê kanaleke televizyonên girêdayî pergalê jî nivîseke bi vî rengî dihate xwendin: "Televîzyona me ji ber Zagona 3984'an bi biryara RTÜK'ê bo rojekê hatiye girtin." Ev televizyon, bi piranî ji ber sedemên sîncî hatine girtin.

RTÜK'ê ji roja ku ava bûye (1994) û heta meha rêşemîya 1998'an 303 roj cezayê girtinê li sazîyên weşanê birîne. Ligel ev qas cezayê ku li sazîyên weşanê hatine birîn, heta roja îro ji kesî deng derneket. Lê heftêya çûyî amadekarên bernameya "Olacak O Kadar (Ew qas jî dibe)" û bi taybetî jî Levent Kırca li hemberî biryara RTÜK'ê serî hilda.


RTÜK'ê ji ber bernameya wan rojek cezayê girtinê li Kanal-D birîbû. Lewre di bernameyê de lasayîya Wezîra Dewletê Işıl Saygın di hate kirin. Kırca da zanîn ku ew ji bo protestokirina biryara RTÜK'ê dê êdî bernameya xwe nede weşandin. Her wiha wî roja 2'yê sermawezê bi Serokê Meclîsa Tirk Hikmet Çetin û Wezîrê Dewletê İstemihan Talay re hevdişin pêk anîn. Şanogerê tirk Kırca da zanîn ku heke ew biryara RTÜK'ê neguhere, ew dê dest bi greva birçîbûnê bike.

Li hemberî vî biryara Kırca, hinek derdorên demokratîk piştgirî da Kırca û helwesta wî wekî helwesteke demokratîk nişan da, heta di Kongreya Sêyemîn a HADEP'ê de biryara şermezarkirina sansûra RTÜK'ê hate girtin û piştgirîya Levent Kırca hate kirin.

Lê Kırca ji piştewaniya wan zêdetir, dixwaze piştewaniya rayedarên dewletê bistîne, lewre jî pesnê wan dide. Heta jê tê çarçoweya çalakiya xwe teng digire. Lewre jî biryara wî ya bo greva birçîbûnê li ser daxwaza Deniz Baykal qedand. Birçîbûna wî danekî dom kir.

Birçîbûna danekî

Kırca dibêje, heta kesên wekî Kamer Genç, Işıl Saygın helwestên wiha nişan bidin, dê bi-



Levent Kırca piştî yanzdeh saetan greva xwe bi dawî anî.

bin mijara listikên min. Gelo li hemberî grevên birçîbûnê yên ku 70 rojî dom dikin, birçîna danekî ne hêjayî pêkeninê ye. Pêwîst nake ku ew vî helwesta xwe jî bike mijara listikê.

Ji awayê listikvaniya wî re di şanogeriya de 'şewaza grotesque' tê gotin. Di vî şewazê de nepixandin û bêteşkirina rastiyê heye. Gelo ev helwesta wî ne tişteki 'grotesque' e? Kırca her tim dikeve dilqê hinekên din, gelo wê yekê ew ji gewherê wî dîr nexistibe? Di bernameya wî de mirov helwesteke hevgirtî nabîne, bêhawayî balê dikişîne. Rojekê polîsan rexne dike, roja din di milê wan de ye. Ew li ser dîka pergalê, wê rexne dike, lê dîsa li gorî pîvanên pergalê bi xwe. Ew êrişî kêmasiyan nake, lê êrişî kesane dike. Lewre li gorî wî kêmasî di kesane de ne, sîstemê de kêmasî nîn e.


Li aliyê din hinek kes jî balê dikişînin ser dema ku ew bertek hatiye nişandayîn. Tê gotin ku ji hin xalên ku li ber wan dibin asteng ji Qanûna Radyo û Televîzyonê ya bi hejmarê 3984'an bi rik e. Li gorî xwediyê wan gotinan, meclîsê nehiştiye ku xwediyên pawanên Aydın Doğan, Mehmet Karamehmet û Enver Ören ji italeyên karebayê (enerjî) parê bistînin. Lewre jî xwediyê pawanên medyayê dixwazin bi vî şeweyî qanûna navborî bidin guhartin û rê li ber xwe vekin.

Piştî van gotinan mirov dikare bibêje, dengê ku ji Kırca derket, tevî hemû şik û gumanan dikaribû rê li ser pirsîyarkirina sansûrê vekira. Lê ji ber helwesta wî ya grotesque, ew yek neçû serî. Divê derdorên demokrat, dest ji teriya kesên din berdin û bi xwe dest bavêjin kar.

S.BERBEYAN

TÎŞK

Razêk û helwêstêk



SÎRWAN REHÎM

Lê noy mangî oktobereve, dujminanî kurd, azadî û ciwanî kewtine cêbecêkidinî pilanekî gemar ke sercem Kurdistanî dayik degrêtewe û be taybetî bizavî emroy bakurî Kurdistanî, ke biwe be nikê li dili turkan da û detirsîn bibene gilewe, her waş debet û dozî reway neteweyek bin gil nakrêt. Diyar e ew hêriş ewende ber firawan e ke zewî û asmanî wîst û arezûşmanî girdewe. Belê hêrişî nefamane û naşarîstanî faşîste turkekan sîmalî çawşînî kurdanî şilwê kird û bo çend rojêk reşêba asa gerekî bû pencerey hîwaman li girêjne derbihênêt. Bo ew mebeste nûserî em çend dîre razêkî pir xoşewistî le çend dîrêkî kem da berceste kirdiwe û lere da tomarî dekem. Be diway ew da helwêstêk dît ke be pêwîstî dezanim ewîş lere da û bo mîjû tomar bikem, ta ku kes zat nekat be nawî kesî tirewe helwêst tomar bikat û qîsey heleq û meleq bilaw bikatewe.

Wituyane: çiraş xamoş bê... Dil xamoş nabê.

Çend rojekê neyaranişî çîw û azadî gerekîyane çîray malî kurdan xamoş biken. Gerekîyane: Zimanman bibrîn û çawman helkolîn. Belam çekme reşan nişanvan nepêka û naysîpêkin îdî minarey bêjinziravî deng û rengî û kurdan nadîrêt, espî miraz çîwarpelî le go naxrêt û micro nakrêt. Lewra regî qul û piwetî azadî le henawî xelkewe serçawe degrêt.

Ey nabînin, geli kurd çon le rojî tengane da bawêşî wêfa bo deng û rengî xoy dekatewe, bawêşî bo dekatewe û le gemeroy neyare serşêtekan da tenha bal be cêy nahêlêt !! Ey ewe niye riqî pîrozî gel biwe be wîzey le kota nehatûy em minare bêjinziraveman!! Em minareyey ke hemû Kurdistanî le gilênay çawekani da kokirdotewe. Em minare bejinziraveman..Em çira be şewqey malî rageyandin û roşinbîrman hest be xoşewistî hemû ew cigergoşane, ew azîzane dekat ke lem rojî tenganeyê da amazî xoşewistî bo degrînewe.. û pêşyan delêt:

Ta êwem hebin, minîş hem û dilim be êwe xoş û pir coş e.

Her boye çiraş xamoş bê, dil xamoş nabê û îdî neyaranişî nefam natwanin hest û evîni kakman le kin kiwêr biken.

Her lem riwangeve dememwê be kurtî û be kurdî helwêstêkîş tomar bikem, ke dexwazim be qîseyekî şarîr nawdar Şêrko Bêkes serî qîse bikemewe. Ew şaire gewreye hawîni salî 1993 le şarî Stenbol le kobûneweyekî rojname-nûsî da wîfî: "Bakur çaw û serî Kurdistan e." Diyar e min namewê ew qîseyey kak Şêrko şîbikemewe, belam ew dem û êstaş ememanan û gelêkî tîrîş le rûy jîrbêjiyewe eweman pê pesend biwe û hestman be girîngêti Bakur le cestay Kurdistan da kirdiwe, çî wek helkewtey stratejî û çîş wekû zorî jîmareman le wê. Belam lewe bitrazêt ême mafî serêti bi mirovan nabexşin û rewya niye kesman ne bibin be ser û neş be leşî yektir.

Kurd delê : Qîse hezare diwanî be kare min bo xom ta nûsînî ew dêrane, rêgey geranewêşim pênadîrê bo amêzî welatekem. Diyar e dagîrkeranî Kurdistan kelemî ser rêgay mebest in, belam min her rêbwarî rêy heman ew işq û azadiye debim, madam asoy serfirazî kurd û mirovayeti têda debînim. Eme wekû naz û minet nalêm û hedî ewêşim niye, tenha le songey ewe da deylêm ke ême le sengerî dozi neteweyî û xizmet be rastî dayin, îtir pêwîst nakat serî kes bikeyin be diskî kurdayeti û kurdawetîman fêr bikat... çî pêwîst e min bibim be derwêş û leş û ligî kesani tîr. Ba ew kesane (kese) le min û zorbeş xizmetguzar tîr bin (bêt) yaxud şorsgêrî gewre bin, ba bibin (ba zor gewre bin) girîtêk niye. belam ewe nabê waman lê bikat ke serî mebest le serî kesêk da berceste bikeyin... Tenha ewe bese ke ême û zorbeş gelîş rêz û hurmetî mezin pêşkes be gewre şorsgêranî xoman dekeyin, pêwî wabê ewêş medayay zêrine û ser singî xizmetguzaranî rasteqîney pê derazêtewe.

Wituyane: Qedrî zêr le lay zêringer e.


Evdila Xan Beg

Le lê dayê Çolemêrgê hey hey...
 lê av negeve hey
 Lê lê dayê min got siwarên
 bendewaran têwo û celeb celeb lo
 ax hey lê lê
 Lê lê dayê xwezîka ji xêra
 Xwedayê mezin re min
 Ebdila Xan Begê xwe
 dîtîba (di) xanîka Tewrêzê de.
 Wey lo bavo min got îro li me şîn e
 şahî betal e lo lo ... hey
 Wey lê dayê Çolemêrgê hey, hey,
 hey hey hey lê textê walî paşayê
 lê lê
 Lê Lê dayê min got cawê pecawê,
 mektûbê pê mektûbê (li) welatan
 gêrayî
 hey hey û li welatan gêrayî
 Lê lê dayê min got îro caweko ji
 min re hatiye dibê Evdila Xan Beg
 xunka Tewrêzê de, mîna
 guleka gul de mayî
 Lê lê dayê min got Evdila Xan
 Begê minê hêdî hêdî ji Çolemêrgê
 hatî xare haw, haw... û lê hey hey
 hatî xwaro lo lo.. ax hey lê lê

Lê Lê dayê min got dar cigara
 Evdila Xan Begê min yesmîn e
 how how..
 Serdar Cigara wê kehreban e lê lê
 Lê lê dayê min got îro wê pêlê ser
 pêlê lê dîto; wele dükêlê ber
 simbêlê
 Evdila Xan Beg lifa li xwe dite û
 lê lê şûbhê maran
 Lê lê dayê min got îro caweka ji
 min re hatiye dibê
 Evdila Xan Begê
 Xanika Tewrêzê de bi sê gulan
 brîndar e
 Lê dinê de bavênê begê dibê de
 bavênê hey wele îro li me şîn e
 şahî betal e lo ho hoy...
 Lê lê wey canê pê memoka minê
 wey canê lê hey hey te sing deştê,
 memik zozanê
 Te wê li min xirab kirî textikê
 Çolemêrgê lê bacarî wanê
 ax hey lê lê
 Lê lê dayê min got li vê astengê
 hey ho wo... lê heto (bi) pirê
 Lê lê dayê xwezîka ji xêra

MEHMET BEGÊ MÎRÊ BOTAN

Hey hê!...hey hey... hey la dinyayê
 De gelî hesapdarên
 Çirî çî çûye çirî çî maye
 Hesapdarên mezin dibê(je)
 Wele çiriya pêşîn xilas bû
 hey hey paşî sê şev maye
 ser kopê (Girtepe) bilind girtine Xûsigê xunavê hey haye...
 Dibêjine wele nêrîgî kuvî
 ketiye ber hezina mirinê
 Xwedê kinê tîfingê ji nêrî bi xwelîfên (wergêre)
 Hey mala minê bidine tenîsta vê bizinê hey hey heyla dinyayê
 Emê tu caran nahevînin
 Ji xeynî çeperê hey lo bavo
 dar kivehtê (navê darê) hey hey hey lê dinyayê
 Tîfingê Mehmed Begê Mîrê Botan filite hey hey hey mala minê hey..
 hey kît bi kît e ne wele bavo cot bi cot e.



Xwedayê mezin re min du şair
 hebûya ho wo hoy...
 Ew şairê deng bistirê, ax hey lê lê
 Wele min dê yek bidanîba koça
 pire ya di(n) danîba wê alî pirê
 Wele min bizanîba ji min re
 kuştina Emo Bişaran di destê
 dêrhîniyan de min dê bidaba kodê
 demanê ser van şehşa vê hêstirê
 ax hey lê lê.
 Lê lê dayê man got şereka deynabû
 how how warkê delalê ax hey lê lê
 Lê lê dayê min got van sebavê
 mitirba dav vedane lê lê dav
 vedane lê lê ax hey lê lê
 Wey lê wekî min bizanîba kuştina
 Emo Bişaran wê di destê
 dêrhîniyan de.

Min dê bidava kodigê ser va
 kodedemana lo lo..ax hey lê lê
 Lê lê dayê ming ot me şereka deyn-
 abû xwarê xwelê
 hey hey hey...
 Me wê heleka deynabû xware
 xwelê lê lê... ax hey lê lê.
 Lê lê dayê min go tene ji wê ve
 xort û xweşmêrên dêrhîniyan devê
 tîfingên wan eyne lê lê..
 ax hey lê lê
 Wey lê xwihe reşê şînê, çawa
 derbeke le dabû bejnîka bala
 Emê Bişaran
 Wele min got sibê heta danê êvarê
 xwînê li birînên vî xweşmêrî ve tê
 kelê.
 BERHEVKAR: SEYDA GOYAN
 HERÊM: GOYAN

Ji herêma Torê gotinên pêşyan

- Çav ji çav bawer nedikir, heta poz kete nava wan.
- Berû ji qalikê ket got 'devî çend e'.
- Heya peyv neyê karê, yek naçe biharê.
- Ku gur ji berfê tirsiyabe wê kulavekî çêke.
- Neyar pêşî li pê, paşê li ser dinêre.
- Sala serhêjan, çêtir e ji ya dûvhêjan.
- Gotin pisîkê gûyê te derman e, ew firî çû ezmane.
- Navtêdan ji desthîlanînê çêtir e.
- Çavê kor ji yê şerbitî çêtir e.
- Silêmanê sikakê her roj diqulibîne awakê
- Xwesteka rûreş in, hevala perîxweş in.
- Dayik û zaroya şer kir, bêaqilan bawer kir.
- Rojî neçû qulê, hej jî bi serê dûvê xwe vekir.
- Yê ku ne li malekê, nizane hewalekê.
- Huner çek e, bin çengê xwe ke, roja te hewce bû wî veke.

Ji Firat Cewerî du berhemên nû

Heftaya çûyî du berhemên nû yên berpirsê Nûdemê Firat Cewerî gihîştin ber destê me. Her du berhem ji aliyê naverok û teşe ve, ji hev gelekî cuda ne; ji wan yek hevpeyvîneke nîgaşî (xeyalî) ye û ya din jî çîrokeke manzûm e.

Li mala Mîr Celadet Alî Bedir-Xan

Ev pirtûk her wekî li jor jî hate gotin, gotûbêjêke nîgaşî ye û ligel danerê alfabe û rêzimanê kurdî Celadet Bedirxan hatiye kirin. Dema hevpeyvîna nîgaşî hate gotin divê wisa neyê fêmkirin ku dîtînen di pirtûkê de jî nîgaşî ne. Lewre nivîskarê pirtûkê Cewerî dide zanîn ku ji bilî, deh rûpelên destpêkê hemû gotinên Celadet Bedirxan ji berhemên wî yên cur bi cur hatine wergirtin. Cewerî ji bo ku vê berhemê derxe holê gelek berhemên Bedirxanî xwendine. Ji wan berhemên hinek bi tirkî bûne, lewre jî wî ew li kurdî wergerandine, ji bilî vê destê xwe nedaye zimanê wî jî.

Li ser mijarên cur bi cur dîtînen û ramênên Celadet Bedirxan di nava rûpelên pirtûkê de cih girtine. Bo nimûne, Celadet Bedirxan rexneyên tund li kesên ku bi kurdî naxwînin digire û dide zanîn ku kurdek herî zêde dikare di

nava mehekê de hîni xwendin û nivîsandina bi zimanê xwe yê maderî bibe. Disa li ser berhemên xwe, rêzi-


wênayên balkêş ên Bedirxanî jî balê dikişînin. Her wiha wênayê foto-montajê li berga paşîn a pirtûkê jî şayanî

weste. Li dor bûyereke ku hatiye serê wan, awayê jiyana wan, derd û kulên wan tîne zimên. Malbat ne dûrî nivîskar e, mala apê wî bi xwe ye. Malbata ku li gundekî derdora Nisebinê matotê dike, mercên giran ên ku ew tê de dijîn, nakokiyên wan bi axê re li ber çavan tê raxistin. Di nava çîrokê de rexnekirina feodalîzmê, pesnê şoreş û şoreşgeran heye.

Di dawiya pirtûkê de agahiyên li ser rewşa îroyîn a kesên ku di pirtûkê de qala wan dibe, hene. Tê dîtînen ku malbat, malbateke welatparêz e, yek ji wan di nav refên gerîla de ye û hinek jî ji ber bîr û çalakîyên xwe yên şoreşgerî di girtîgehê de ne.

Li gorî gotina nivîskar ev pirtûk di salên 1980'yî de hatiye nivîsandin, pêşî hêjayî çapê nehatiye dîtînen, lê piştî ku van rojên dawîn jî nû ve xwendiyê ji ber hest û ramênên wê demê jîndar bimîne, ev berhem hatiye çapkirin. Di nava pirtûkê de romantîzma şoreşgerî ya ku di berhemên Cewerî yên din de nayê dîtînen, heye. Lê di nivîsandin û hûnandina çîrokê de hinek kêmasî balê dikişînin. Zimanê pirtûkê gelêrî ye, lê ne zimanekî kemilî ye. Ev pirtûk jî li ser kaxizeke biqalîte hatiye çapandin û ji 119 rûpelan pêk tê.

SERWÎSA ÇANDÊ



manê kurdî jî tiştên balkêş dibêje.

Ji bo kesên ku dixwazin Celadet Bedirxan ji nêzik ve nas bikin, ev pirtûk bikelk û sûdewer e. Pirtûk li ser kaxizeke biqalîte çap bûye û ji 128 rûpelan pêk tê. Di nava pirtûkê de gelek


dabaşê ye. Di vî wênayî de Firat Cewerî û Celadet Bedirxan li dor maseyekê, li hemberî hev rûniştine.

Çîroka malbata Evdo

Di vê çîroka manzûm de Firat Cewerî li ser jiyana karkerên pembû radi-

Bûyerek û xisletên neteweyî

HASAN KAYA



Piştî livbaziya firoke revandinê, siyasatmedarê tirk Ecevit, di hevpeyvîna xwe ya bi çapemeniyê re tiştê got: "Divê ku em vê bûyerê wekî filmekî belgeyî çêbikin." Bi ya min Ecevit tiştê gelekî rast û di cihê xwe de gotiye. Lê kêma gotiye. Divê ku ev bûyer ji serî heta binî bibe filmekî belgeyî. Divê ku kurd jî vê bûyerê ji serî heta dawî bihejînin, tîkiliya bûyerê bi dîroka kurdan re çêbikin û filmekî belgeyî derbixin holê.

Di nav heşt saetan de, hemû pêvajoya dîroka kurdan û serdestên tirk di ber çavên min re derbas bû. Min dîroka kurdan û serdestên tirk di nav van heşt saetan de dît. Dibe ku mûyê serê gelekên ji me gîj bûbin. Dibe ku ji hêrsbûnê sergêjek li gelekên ji me geriyabe. Dibe ku gelekên ji me di nav heşt saetan de paketek cixare qedandibe. Dibe ku bê hemdê xwe, wê gavê me dilê hinek mirovên li der û dora xwe hiştibe. Ji ber ku em hêrs bûbûn. Lê ez dibêjim dibe ku mirov ji rastiya xwe razi nebe. Dibe ku mirov bi çarenûsa xwe qayil nebe, lê mafê me yê hêrsbûnê tune ye. Ji guhartin û guherandinê pê ve tu rê û derî li pêşîya me tune ne.

Baş e, min bi çî awayî dîroka kurdan û ya serdestên tirk di vê bûyerê de dît. Beriya her tiştî serhildêrê bi navê Erdal Aksu mîna hemû serhildêrên dîrokî yên kurd li hemberî zilm, çavsorî, xap, rîp û dolabên serdestên tirk xwediyê rikeke afatî ye. Ji xwe van heftayên dawîn kirinên komara tirk nefrekeke mezin kiriyê dilê her kurdekî welatparêz. Hewldana tarîkirina "roja kurdan", gotinên nexweş ên ku ji bo serokê gelê kurd hatine gotin, êrişên li ser HADEP, MED-TV, Ûlkede Gündem û saziyên din bûye xwê û ketiyê ser dil û cergê kurdên xwedî xîret. Erdal Aksu, tevî wan mirovên ku xwe di zindanan de kiribûn gilokek agir hêrsa kurdan a dîrokî dianî zimên.

Çawa ku kurdan di pêvajoya dîrokê de her dem bi daxwazê pak, safî û mirovahî mafê xwe xwestine û heta ji wan hatiye di tîkoşîna xwe de, rêbaz û kirinên kirêt û ne li rê nekiribin, tevî rêwingiyên di hundirê balafirê de hemû raya giştî ya cihanê û rayedarên tirk jî ev daxwaza di dilê Erdal Aksu de baş dizanibû. Safbûn, paqijbûn, dilovanî, dilnêrmî, mirovperwerî, bext, xwedî sozbûn xisletên gelê kurd in, Erdal Aksu jî xwediyê dilekî wiha bû. Çawa ku di dîrokê de em ji ber vê taybetiyê tîk çûne û şkestine û dagirkeran jî vê hêla me sîd wergirtiye, di vê bûyerê de jî ev rastî dubare bûye.

Taybetiyên serdestên tirk bi çî awayî xwe dane der? Kîjan taybetiyên wan ên neteweyî di vê bûyerê de dixuyin? Xapandin, bêrûmetbûn, xwînhezî. Çawa ku di hemû serhildanên kurdan ên beriya gelawêjê de, tevger serokatî hatine

xapandin û dawî jî hatine qirkirin di vê bûyerê de jî ev karekera serdestên tirk dubare bûye.

Nêta Erdal Aksu ya pak cesaret û moral daye rayedarên tirk. Lewre jî, ji wan re min tîgîha nêremok got. Disa dilovanî li dijî wî hatiye bikaranîn. Yên ku ji bo destavê destûr ji Erdal Aksu xwestin di deriyê paş re derketin û qesab di şûna wan de ketin hundir. Ango Erdal Aksu hate xapandin. Tê zanîn ku tirk li hemberî kurdan olê bikar tinin, lê dema ku li hesabê wan neyê guh nadin ezanê (bangê) jî. Rojnameyên tirkan dibêjin, "ji bo ku Erdal Aksu nizanibe ew li Enqereyê, ew bizanibe ku ew li Sofiyayê destûr nehat dayin ku mele banga sibehê bidin". Ji xwe re li vê rovîtiyê binêrin. Ev çî bêbextî ye.

Rayedarên tirkan wisa dek û dolabên xwe yên Bizansî, Osmanî, Moxolî bikaranîne ji Erdal Aksuyê bihuştî û nûranî wê ye ku bi rastî jî ew li Bulgaristanê ye.

Taybetiyêke din a serdestên tirk a dîrokî jî mîrkujî û qirkirina bi hovîtiyê, wehşet e. Dema ku timên wan wezîfeya xwe bi cih anin, armanca wan, ne girtina wî ye. Armanca wan kuştin e.

Û dema rayedarên tirk ên herî mezin jî di heqê vê bûyerê de, axivîn û kuştina çalakdarê ku dê di 75. salvegera damezrîna komara tirk de, bal bikişanda ser qirkirina kurdan, dihat zimên, gilêz jî devê wan diherikî. Kê ji wan devê xwe vedikir peyva xwe, wiha diqedand, "di vê bûyerê de, kifsî bû ku em li cihanê şampiyon in." Ez jî dibêjim, hûn rast dibêjin. Yê bibêje hûn ji aliyê qeleşî, bêbextî, hovîtiyê û xapandinê ve hûn ne şampiyon in, ew dê kor bibe...



Mele Remo

nekin." Mele dike nake gundî wî bernadin, hema şaşika serê xwe, ji serê xwe dike, datîne erdê û ji şaşika xwe re dibêje: "Mele tu li vir be! Remo tu here şer." Gundî wî berdidin û mele dikeve nava şer.

Hecî Hesen û Zarok

Mirovek bi navê Hecî Hesen hebûye, pir qurnaz bûye, bi qurnaziya xwe gelek kes xapandiye. Rojekê Hecî Hesen bi rê ve diçe, rastê zarokêkî tê. Di destê zarok de kêreke pir xweşik hebûye. Hecî Hesen dibê-

je: "Ez ê vî zarokî bitirsînim û wê kêrê jê bistînim." Diçe pêşiya zarok bi destê xwe hereketan dike, çavê xwe zil dike. Lê ji ber ku zarok ji wî qurnaztir bûye, dibêje: "Netirse Hecî ez te naxwim!"

BERHEVKAR: MEHMET AKAY

BBC li Wanê nakişîne

Di sala 1992'yan de em çûn Wanê. Komek li der û dora me kom bûbû. Di av wan de kesên bürokrat gelek bûn. Wekî serokê SHP'ya Wanê û hwd.

Min ji ber ku wê rojê li nûçeyan guhdarî nekiribû, min pirsî: "Gelo êvarê çî di BBC'yê de hebû." Li ser vê pirsê xortekî got: "Wele ez nizanim çiqas ji bo we bürokratan girîng e, lê êvarî di BBC'yê de partiyê belavokek belav kiribû û tê de digot: "Kurdên ku berpirsyariya wan di partiyên burjuva de hene, divê dest jê berdin û yên ku serokê navçeyan, wilayetan û belediyeyan in divê berdin."

Ez serokê belediyeyê bûm û li kêleka min Serokê SHP'ê yê Wanê hebû. Min lê nêrî. Lawekî apê wî linik me bû, got: "Abê ma tu çima li pismamê min dinihêrî, BBC li Wanê nakişîne û lawê apê min nebihîstiyê."

Miço û Mizgeft

Reisê belediyeyê û şef dîsa bi hene-

kî li hev ketin. Reis li derve mêze kir û got:

- Binêre Ehmed Axa û Miço ji bo nimêjê diçin mizgeftê, tu çima naçî?

- Ez zanim Miço ji bo nimejê naçe mizgeftê.

- Ji bo çî diçe?

- Wele Miço ji bo nimêjê naçe mizgeftê. Ez baş dizanim ji bo ku pêlavê axa neyên dizin, diçe mizgeftê.

Ezraîl û Axa

Axa û jina wî li mal rûniştibûn û xulamê wan jî xizmeta wan dikir. Deriyê odeyê vebû, mirovek ket hundir û got: "Ez Ezraîl im. Ez hatime rihê du kesan bigirim."

Axa û xanima xwe ketin nav tirsê û berê xwe dan xulamê xwe. Xulam fêm kir û bi rehetî got: "Belê axayê min. Belê xanima min. Min fêm kir. Ji bo Ezraîl yek ez im, lê Ezraîl du rihan dixwaze."

BERHEVKAR: NEJDET BULDAN

Li Amedê li navçeya Bismilê li gundê Koso mirovek hebû, navê wî Mele Remo bû. Rojekê di nav malbata Mele Remo û malbateke din de şer derdikeve. Mele Remo jî dixwaze bikeve nava şer û şer bike lê çend heb gundî wî digirin û dibêjin: "Mele eyb e, şerm e, tu mele yî! Divê Mele şer

BI XELAT...


XAÇEPIRSA BI XELAT (145)

XAÇEPIRSA


Papir	1	K	2	E	3	E	4	A	5	Z	6	H
Herfên	L	E	M	L	A	K	A	P	L	A	N	
Bilav	S	E	V	L	A	R	U					
Herfên	K	S	W	E	R	E	S	I	R			
Herfên	S	I	R	B	Z	F	O					
Herfên	M	A	X	E	R	E						
Herfên	M	E	N	A	F	E	V					
Herfên	D	N	A	V	A							
Herfên	L	S	A	R								

Bersiva Xaçepirsa 143'yan


Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin destê me, em dê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 145'an Pirtûka Weşanên Aram 'Licelî Delikanli'ye **Jêrenot:** Ji bo ku bersiva we bê nixandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.



Pozitif	Zelal, bitav	Sala çûyi	Arik, tawan	Sembola	Eyni
Wêne	Tipan pîncan	Perestgeha ezîdîyan	Tipa dû h'yê	Argonê	
		1		Torin	
Pirtûka mizgîn	Evindara mirov		Sembola kükürtê	Qertafa neyênî	
	Cuda		Sebeb	4	2
			Şemsiye		
Dengdêrî dinik		Notayê de sekin	Tipêke kurdî	Bi devokî "ev"	
Gîhanekek		Daneke rojê	Girin		
3	Rengêk Straneke Ciwan Haco	5		Îrade	
				Tipêk	
Mêweyek			Cih		
Daçek			Belengaz		
	Sewal			Paşgîrek (berepaşki)	
	Rojek				
Serborî					
Êş					
		Tipa dû q'yê	Bersiva neyênî		



PEYVA VEŞARÎ



Enqere bi slogananê şoreşgerana hewn ra werîşt

Aşew kesî vatê qayê raya mabenê Stenbol û Enqerî ala pilpilkina xemilyêbî. Her new-des metran de finê jû erebe wa pilpilkina aysayê (vinyayê). Ê eraban miyan ra vengê deyrane aşti û slogananê serkewtin amayê. Ca ca otobosê ke pilpilkina xemilyaybî vindartê û raywanê ci ameyê war, bi coş û kêfweşîna govend antê. Raywananê binan jî şaşmendina ewnayê înan ra ke, se biyo, hendayê şaro na şewa tarî, çira wina deyrî vanê û govend ancenê? Bi rastî jî çiyê (tevyê) do ecêb bi.

Ray ala pilpilkana bibî pir. Ê kê pey hesyay Kongreyê Partiya Demokrasiya Şarî (HADEP) esto, coka iyê şinê Enqere şaşmendina ci heveyê ravêrd. La belê heveyê estîbî ke vatê, dewleta nînan rê hend vardayinî virazene, iyê ancî kemî nêbenê. Na şewa payizî de geç û qul, cenî û camêrd kewtê ray, ze ke şirê veyve.

HADEP'ijan a şew slogan çekerdina, deyrî vatena û îşareta serkewtin kerdina Stenbol ra hetanî Enqere raywanin kerd. Wexto ke Enqere de raywanin ser qalî abiyay, endamanê HADEP fikr û vînanî xo wina ardê zîwan: "Ma hetanî nika zey nezdiyê na raywanin, xeylê raywanin viraşt. La belê hal û tamê na raywanin qe zey ê verinan nêmendê. Çimki dewlet senî kerd, nêşa verê vêşî tewrbîyin bigiro. Ma kerdananê xo ya wastenê dewlet ci qirik de ternay".

Bi rastî jî winî bi. Çimki biyayanê peyinan ser kesî vatê qayê, polîsanê dewleta tirk karûbarê xo viradayo endam û bananê HADEP rê vardayin virazenê. Hele rojê ke kongrey nezdi ameyin de, polîsî hend bibî har ke her roj jew-di ba-



nanê partî rê vardayin viraştê, endamê partî girotê binçim. Peynî de Serokê HADEP'a Stenbolî Av. Mahmut Şakar jî girot binçim, hewt rojî binçim de te-pişt. Bado 12 endamanê partiya piya çebiya girotxaneyê Ümraniye yê Stenbolî. Goreyê vatenan mehkema wastena berpirsyanê polîsan ser biryarê zereçekerdinê serokê Stenbolî dayo.

Nê vardayinî pêro qandê endamanê HADEP tersaynayin û taynkerdina tewrbîyinê kongrey bi. La belê endamanê partî cewab û nêtarsayinê xo tewrbîyinê kongreya û pêrin piya slogananê "Bijî HADEP", "Vardayinî nêşenê ma bitersaynê", "HADEP partiya şarî ya" da. Nezdîyê 35 hezaran şewra rewê 1'ê meng de verê ewyana Yükseliş Koleji kerdibi pir. Hem jew verê eywan jî nê,

çoşmeyê eywan jî endamanê partiya bibi pir. Endamanê partî hetanî seat 8 ver û çoşmeyê eywan de govendî antî, deyrî vatî û slogani çekerdi. Vengê sloganan û deyran hend gur vejyayê ke êkê 1-2 km dûrî de eywan de ronîştê, vengê deyran û slogananê endamanê HADEP'a hewndê xo ra werîştîbî, vejyaybî hortman (şaneşin) sera çimê xo yê hewnin vilênayina ewnayê ke, se biyo û o veng o kotî ra vejyeno.

Seat ke bî heşt, keverê eywan abiya û des pancês deqan peyra eywan miyan de cayo ke kes xo biluno nêmend. Coka wexto ke kongrey dest pê kerd serdarê partî mecbûr mendî, cîhazê newey ardî tevera ronay ke, êkê tevera mendê, ê jî tevera veng û qisanê qiseykerdoxan bîşnê. Seat dest de zere, tever û çoşmeyê eywan açariyabi cayê veyvî. Ê kesî nêwastê ke rojo wina rind û weş biqediyoy.

Serokê Giştî yê HADEP Murat Bozlakî qiseyê akerdinê kongrey politikayê dewleta Tirk rexne kerdî û wina vat: "Ewro xeylê meselê Tirkîye estê, la belê nê meselan miyan de winî jû mesel esta ke, hetanî na mesel çareser mebo, qe jû mesel çareser nêbena. Na mesel jî, mese-la kurd a. Mesela kurd, kurdan û sazîyanê kurdan rê vardayin viraştina, Suriye û cîrananê binan tehdîtkerdina û şerîherakerdina çareser nêbena. Raya çareserkerdina mesela kurd, raya demokratîk û siyasî ya. Zewbî rayana na mesel çareser nêbena".

Serokê HADEP Bozlakî weçinayino ke 18'ê menga avrêla 1999 de viraziyo ey ser jî wina vat: "Ma tim û tim weçinayinê demokratîkî rê hedreymi. Ma yê


Ray ala pilpilkana bibî pir. Ê kê pey hesyay Kongreyê Partiya Demokrasiya Şarî (HADEP) esto, coka iyê şinê Enqere şaşmendina ci heveyê ravêrd. La belê heveyê estîbî ke vatê dewleta nînan rê hend vardayinî virazene, iyê ancî kemî nêbenê. Na şewa payizî de geç û qul, cenî û camêrd kewtê ray ze ke şirê veyve.

wazem hemû partî çoşmeyê pêdûştin de tewrê weçinayinî bê. La belê ma ke ewnaymi rewşê ewroyin teva yo winaynîno nêayseno. Serdarê dewletê jû kiştra qalanê weçinayinê demokratîkî kenê, kişta binra jî nêviradenê ez şirî Amed. Wa serdarê dewlet nay rind bizanê, wexto ke şarê Amedî vat, HADEP yena vîrî, wexto HADEP vat jî, şarê Amedî yeno vîrî. Serokê HADEP meviradê Amed peyra vejyê û qala demokrasi bîkirê. No dirîyin û korin o. Şima belkî ewro mi nêviradenê la belê meşt (siba) şimayê mecbûr bîmanê, mi viradê Amed."

Qiseykerdinê Bozlakî peyra xeylê meymanan û endamanê partî qisey kerdî, pêrin jî politikayê dewleta tirk rexne kerdî û pêrin jî wast dewleta tirk rojê ravey politikayanê xo yê ewroyinan bivurno û hetê demokrasiya bîkemî gam çekiro. Kongre de xeylê kesanê namdaran, nûneranê dewletan, partiyanê dewletanê binan, komalanê demokratîk, Dr. İsmail Beşikçi û mebusê DEP Hatip Dicle, Leyla Zana, Orhan Doğan û Selim Sadakî jî mesaj rîştîbî.


Qiseykerdinanê meymanan û endamanê partî peyra Koma Gulên Mezrobotan vejyay sahne ser û deyrê aşti û birayin vat. Nê deyran ser, coş û kêfweşîne tewrbîyayoxan heveya zêdna. Coş û kêfweşin hetanî şan ramit, şan de qandê serokê giştî, endamanê meclîsa partî û endamanê komîsyonê dîsîplînî weçinayin viraziya. Peyniya weçinayinî de Murat Bozlakî rayê hemû delegan girotina fina bi serokê partî.

MEMED DREWŞ



Me jîyan di hêstirên çavên dayikan de dî
Me riwê rastiyê di bedena xwe de dî
Me şerên salan di mejiyê xwe de ava kir
Me dijîminê xwe di kozika wî de fetisand
û tîrêja rojê berê me da nav şoreşa Kurdistanê
Em jî ketin nav karwana nîrxên neteweyî

FETTAH BALTA



CEMAL BALTA

Fettah Balta, di 29'ê kewçêra 1996'an de ji aliyê îtirafkar A.Kadir Bingöl û Faruk Tekin ve bi bêbextî hate qetilkirin.

Em li ber şehadeta we û şehîdên şoreşê bi hürmet serê xwe ditewînin

Li ser navê welatparêzên Zengê malbata wan

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)
■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN
■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)
251 79 37
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım
■ NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel: 0 (232) 425 37 02
München:

(Nünerê Giştî yê Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swisre:

İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiç

Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Boztrak:

Êdî em naxwazin dewlet li serê me bixe

Ji her cihê HADEP'î hatibûn. Jinikên bi kincên neteweyî, kalên bi şaşikên kesk û sor û zer û yên ku qet tiştek ne xema wan bû, ji titûnê qaçax çixare dipêçandin, dîsa ciwanên ku bi ala HADEP'ê ber li Mistefa Kemal girtibûn, bi awayekî watedar, li ber çavên polîsan, ew tiştek nedihesiband.

Di Kongreya Duyemîn a HADEP'ê de, dewleta tirk bi hinceta xistina ala tirk, bi alikariya çapemeniya xwe ya şûrkêş, xwest ku li dijî gelê kurd provokasyonê mezîn pêk bîne. Lê belê wê politikayê bi fiyasko encam da.

Piştî du salan dîsa em li Enqereyê ne, lê îcar ne li Spor Salonîya Mistefa Kemal in, vê carê cihê ku ji bo kongreyê dane HADEP'ê li derveyî Enqereyê ye. Salona Koleja Yükseliş. Lê berî ku em li ser kongreyê rawestin, em hinekî çêlî rêwîtiya ji Stenbolê heta Enqereyê bikin.

Şev an jî roj ne xem e, ev HADEP e!


Roja 31'ê meha kewçerê ji bo ku em bi konvoyê re biçin Enqereyê kongreya HADEP'ê li avahiya navçeya Bahçelievler a Stenbolê em saet li nehe êvarî civiyan. Diviyabû otobûs saet li dehan li ber navçeyê amade bûna. Lê belê otobûs hetanî saet yekê şevê nehatin. Lewre polîsan fîrma tehdît kiribû. Di wê navberê de wekî her carî li navçeyê govendê girtin, stran tîn gotin û çîrok tîn xwendin. Gel xwedî moraleke gelekî baş xuya dike. Piştî ku serokê navçeyê şewaza xwe li dijî xwediyê firmayê tûjtir kir, firmayê di navbera niv saetê de çar ota-

bûs şandin ber navçeyê.

Beriya her tiştî organizasyona rêveberên HADEP'ê nedîşibîya organizasyonên berê. Her kesê peywirdar bi sergirani li gotinên rêveberan guhdarî dikirin û tiştên ku dihatine gotin bi gelemperî békemasi bi cih dianîn. Rawestgeha yekemîn a konvoyê tumîke bûn. Heta ku em gihîştin tumîkeyan ji anonsa polîsên trafîkê me ev gotin guhdarî dikirin: "HADEP'î tîn, halê hazir çar otobûs xuya dikin. Ev hemû diçine kongreyê. Bila haya hemû ekîban jê hebe."

HADEP'ê jî vê carê xwe baş birêxistin kiribû û beramberî îxtimala astengkirinê wan biryareke tûj girtibû: "Em ji ser a xwe venagerin. Şer be şer, mirin be mirin." HADEP'î yan xwe li gorî vê biryarê saz kiribû. Lewre di rê de jî tu problem derneket. Rawestgeha me ya duyemîn jî li Kaynaşdağıya girêdayî Boluyê bû. Li wê derê hemû konvoy gihîştin hev û di wê bédengiya şevê de girseyê bi dengê li ber strana "Apê me ha Apê me" govend girtin û bi rengên kesk û sor û zer tarîti û bédengiya şevê kir cihê seyrangehê. Di wê navberê de polîsan jî dora girseyê pêçabû, dema ku girseyê çav li polîsan kir, peyva "Apê me ha Apê me" hê gurtir û geştir bi dengê bilind qîrand. Saet li çar û nivê serê sibehê mirovên ji temenên cur bi cur di serê govendê de bal dikişandin. Dema me licoşa girseyê dinihêrt, me digot qey ev girse diçe ku Kurdistanê rizgar bike. Ji her aliyê ve girseyeke ji xwe bawer û bi xwe ewle bû. Di wê navberê de çend kesên tirk ku li dora govendê sekinibûn di nav xwe de wiha digot: "Ev HADEP e. Şev û roj ji bo wan ne xem e. Ew her cihê ku lê disekin, rengê xwe didinê. Helal be."

Serê sibehê em li dora saet nehan gihîştin ber salona kongreyê. Delegasyon û endamên HADEP'ê di nav çepereke ku ji hezaran polîsan pêk dihat de dîsa govend digirtin. Bi durîşmeyên hê tûjtir vê carê bi dengê ku ji 25 hezar kesî pêk dihat digot: "PKK gel e, gel jî li vir e.", "Bijî PKK, ARGK û ERNK.", "Bijî Serok Apo.", "Destên ku xwe dirêjî te kirin em ê bişikênin." Bi rastî di nêzîkedayîna polîsan de nermahiyek hebû. Ketina hindur



demeke dirêj girt. Em jî di wê navberê de ketine nav gel. Ji her cihê Tirkiyeyê û Kurdistanê HADEP'î hatibûn. Ji Meraşê bigirin hetanî Konyayê. Ji Şimexê bigirin hetanî Sêwasê. Dayik û kalên pîr, li bin siya daran rûniştibûn û nanê xwe dixwarin. Zarokên biçûk ên yek salî, du salî û sê salî, bi coşa rêwîti û azadiyê kurtedem ku durrî welatê xwe ketibûn, xwe dihejand û bi diranên xwe yên ku hêj nû derketibûn wan coşa xwe nîşan dida. Jinikên bi kincên neteweyî, kalên bi şaşikên kesk û sor û zer û yên ku qet tiştek ne xema wan bû tûtina xwe li nav pelên çixarê dipêçandin, dîsa ciwanên ku bi ala HADEP'ê ber li Mistefa Kemal girtibûn, bi awayekî watedar, li dijî polîsan ew tiştek nedihesiband.

Boztrak dîsa Serokê HADEP'ê

Vê carê bergiriya ku polîsan girtibû balkêş bû. Li şeş noqteyan cihên lêgerînê danibûn. HADEP'ê jî li heşt noqteyan cihên lêgerînê danibûn. Bi rastî her kesî jî li ber rêz û rêçikên ku HADEP'î yan danibûn bi rêz bûn. Di kongreyê de 1200 kes hatibûn peywirdarkirin. Jinên HADEP'î yekpare bi kincên neteweyî rengê cuda dabûn kongreyê.

Gelek kesên navdar (çi biyan, çi xwe-cihî) di kongreyê de cihê xwe girtibûn. Piştî ku diwan hate hilbijartin axaftina pêşîn Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Boztrak kir. Boztrak di axaftina xwe de gelek mesajên girîng dan. Boztrak di destpêka axaftina xwe de got ku, paras-

tina aştiyê karê mîrxasan e; ne karê newêrekan e. Boztrak piştî wiha got: "Em Partiyêke Tirkiyeyî ne. Em ê li Trabzon û li Trakiyayê jî xwe bi rêxistin bikin. Problema bingehîn kêşeya kurdî ye. Tu kes ne li pey perçekirina Tirkiyeyê ye. Bila kes guh nede kesên ku ji şer rantê bi dest dixin. Dewlet nepîroz e. Mirov pîroz in. Çi kesê ku ji vê rejimê aciz e, eger dixwazin tîbikoşin bila bîn bin banê HADEP'ê. Dem dema xebata profesyonel e. Êdî em naxwazin dewlet li serê me bixe." Dûv re jî girtigehê li ser navê İsmail Beşikçi, Hatip Dicle, Leyla Zana, Selim Sadak û Orhan Doğan û gelek kesên din mesaj hatin xwendin. Her wiha Akin Birdal, Ufuk Uras, Siyami Erdem û Levent Tüzel jî axivîn.

Piştî van axaftinan rapor hatin xwendin û dîre jî hilbijartin pêk hat. Di encama hilbijartinê ku bi listeya blok pêk hat de Murat Boztrak jî nû ve bû Serokê Giştî yê HADEP'ê.

Bi dehan kes ji çapemeniya şûrkêş hatibûn. Ew li bendeyî keysa xwe bûn. Lê tiştekî li gorî dilê wan pêk nehat. Lewre, wan ji bêgavî pesnê organizasyonê da. Lê dîsa wan dev ji şûrkêşiyê berneda û wiha qala kongreyê kir: "Sîrûda Neteweyî" nehate xwendin. Sloganên PKK'ê hatin qîrandin." Dema mirov kongreyê bi awayekî giştî bîne ber çavan, tê dîtin ku kurd di warê sazîbûnê de gavên baş davêjin.

AZAD AVAŞIN

